




DI DIROKA ME YA NEZİK DE
BÜYEREKE GIRİNG:

KUŞTINA Seîd ELÇI û Dr. ŞIVAN

Seid VEROJ



Seîd VEROJ

***DI DÎROKA ME YA NÊZÎK DE
BÛYEREKE GIRÎNG: BÛYERA KUŞTINA***

Seîd ELÇÎ û Dr. ŞIVAN

Weşanên **BÎR**: 1

Belge, Lêkolîn û Lêgerîn: 1/1

Seîd VEROJ

***DI DÎROKA ME YA NÊZÎK DE
BÛYEREKE GIRÎNG : BÛYERA KUŞTINA***

Seîd ELÇÎ û Dr. ŞIVAN

Berg: *BÎR*

Çapa yekemîn: Tîrmeh 2005-Diyarbakir

Çapxane/Matbaa:

Barış Matbaa Mücellit
Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi
C. Blok No: 274, 275, 276
Tel:(0212) 6748528-29

*Ev pirtûk bê destûra weşanên BÎR
Naye kopîkirin û çapkirin*

BÎR Reklamcılık -Yayın

Inünü cadesi Magül İş Merkezi No: 49
Daðkapı/Diyarbakır
Tel: (0412) 2287828

ISBN: 975-00195-0-4

e-mail: kovarabir@yahoo.com

Naverok-İçindekiler

Destpêk	5
Faiq Bucak (1919-5 Temmuz 1966)	11
Seîd ELÇÎ (1925-1ê Hezîrana 1971)	15
Dr. Şivan (Said KIRMIZITOPRAK) (1935-26ê Sermawêza 1971)	19
ŞAKIR EPÖZDEMİR: Di Dîroka Me Ya Nêzîk da Bûyereke Girîng : Bûyera Kuştina Seîd Elçî û Dr. Şivan	23
Şakir EPÖZDEMİR: Yakın Tarihimizde Said Elçi ve Doktor Şivan Olayı (Önceki yazının Türkçesi).....	45
Derwêşê SADO: Yakın Tarihimizde Said Elçi ve Dr. Şivan Olayı	67
Serafettin ELÇİ: Dr. Şivan ve Said Elçi Olayı	77
Hemdî Ebdulmecîd: Di Derbarê Bûyere Kuştina Seîd ELÇÎ û Hevalê wî da (15. 08. 2002/ Dîyarbekir)	85
Remezanê Îsa: Seîd ELÇÎ Ewil Car di Sala 1970ê de li Gundê Bêzehê Hate Nik Me(30.12.2004)	89
Partî Demokratî Kurdistan-Qiyada Mûweqet: Ronîkirina Li Ser Mesela Şehîdkirina Rehmetî Seîd Elçî û Kuştina Rehmetî Dr. Şivan	91
CUDÎ (Ömer ÖZSÖKMENLER): Said ELÇÎ'nin Öldürülme Olayı	95
Îbrahîm GÜÇLÛ: Trajediyeke Dîrokî: Bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan	99
Beşê Duyemîn: Nivîsarên di Derbarê Dosya Bûyera Kûştina	

Her du Seîdan de	127
Ahmet Kaymak: Kim Katil Kim Maktül?	128
Hasan Cûnî: ABD - İran - Türkiye ve Barzani'nin 1970 'Komünistlerle Mücadele Antlaşması' Ve Dr. Şıvan, Süleyman Münî Ve Arkadaşlarının Katledilişi	132
Derwêşê SADO : Zorunlu Bir Açıklama <i>(DR. Şıvan Olayını, Dr. Şıvan Yaratmıştır.)</i>	139
Fotograf	151

DESTPÊK

Bûyere kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan, ji aliyê muhatabên xwe ve heta îro bi awakî zelal nehatiye aşkerakirin û ronîkirin, her dem bûye mijara(babeta) nirixandinên subjektîv. Rêxistin û kesên ku ji her du aliyan rasterast di nav bûyerê de cî girtine û ji aliyê xwe ve bûne şahidê zindî yê qismekî vê bûyerê, heta îro di derbarê vê bûyera trajîk de daxuyaniyên rast û durist nedane xelkê kurd. Ev helwest, bi hinek sedemên ne di cî de û problemên şexsî naye îzah- kirin. Di encam de têkiliyên dîrokî yên civakî-netewî hene, ne bûyereke şexsî ye. Di nav vê pêvajoya dîrokî de umrê şexis û mirovan kurt e, lê yê civak û miletan dirêj e. Ji ber vê yekê ragehandina encama ceribandînan dîrokî-civakî bo neslên (qirnên) nûhatî, wezîfeyeke me ya civakî û netewî ye.

Divê baş bête zanîn, ku di dîroka millet û civakan de, kiryar û mesûlên bûyeran yan jî subjektên bûyeran, berpirsyar in ku di nav pêvajoyeke dîyarkirî de li ser bûyeran agadariyên rast bidin xelkê xwe. Ev yek ji du aliyan ve girîng e: yekemîn, daxuyanî û agadariya rast dê pêşiya polemîk û şiroveyên nerast bigre; ya duyemîn jî, ew mirov û civakên ku ji pratîka xwe ders dernexînin û bîra dîrokî bi wan re peyda nebe, di nav pêvajoya dîrokê de dubarebûna bûyerên bi ser wan ve hatî, dibe mîsoger.

Du çavkaniyên bidestxistina agahdariyên rast hene: yekemîn, agahdariyên kiryarên bûyeran; yê duyemîn jî, agahdarî û zanînan encama lêkolîn û lêgerînan li ser bûyeran e. Bêguman her kesê ku bi armanca derxistin û têgeyîştina rastiyê, li ser bûyerên dîrokî û civakî lêkolîn û lêgerîn bikin, pêwîst nîn e ku bi xwe di nav wan bûyeran de cî girtîbin. Lêbelê gotinên kiryar û şahidên bûyeran, ku hebe derxistina belgeyên derbarê bûyerê di radeya yekemîn de girîng in. Di nirixandina bûyeran de rêbaza rexnekarî bingeheke, lêbelê tenê bi serê xwe ne bes e. Divê em di nav çarçova pevgirêdaniya dîyalektîkê de li ser bûyeran hûr bibin û bigehin çavkaniya wan.

Di vê çarçovê de li ser ronîkirin û zelalkirina bûyera kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan, rêbaza vê xebatê ev e, ku em daxuyanî û agahdariyên kesên mesul ên di radeya yekemîn de û belgeyên di derbarê bûyerê de bigehînin rayagiştî, ku ew bi xwe şirove bikin,

bi gotinên û faraziyeyên şerletanên sîyasetê ve girêdayî nemînin.

Di dîroka her miletekî de hinek bûyer hene ku pêkhatina wan dibe destpêka qonaxek nû û di paşerojê de jî, ji bûyerên pîrr girîng re rê vedikin an jî dibin sedemê peydabûna wan. Di vê çarçovê de, bûyera kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan, di dîroka sîyasî ya nêzîk a Kurdistanê de du encamên girîng derxistine holê: Yekemîn ev e, ku bûye sedemê merheleyeka nû, ku piştî bêdengiya 30-35 salan, du rêxistinên nûzayî yên tevgera kurd û çalakiya kadroyên wan û berdwamiya xebata wan rawestandiye. Yê duyemîn jî, bûye sedemê pêvajoyeke nû, ku di tevgera kurdî de riya fehma siyaseta xwepêrest, komplocîtî û dijwarî(tundrewî) vekiriye.

Dema ku dijwariya siyasî(tundrewiya siyasî) wek rêbaz û prensîbeke rêxistinî bête dîtî û qebûlîkin, ev rêbaz, kuştin û tunekirina mihalefeta navrêxistinî û derveyî meşrû dike. Di tevgera Kurdistanê bakur de ji destpêka 1900î bigre hate wê gavê, di nav rêxistinên kurdî de ev rêbaz nehatiye bikaranîn qasê ez dizanim. Bûyera kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan, di nav çanda sîyasî ya kurdî de riya vê fehmê vekiriye. Di nav rêxistinên kurd de û bi taybetî jî di nav PKKê de, îro jî, kuştin û înfazkirina bi sedan şoreşgerên netewî yên kurd, encama vê têgeyîştina sîyasî ye. Bêguman ev têgeyîştina sîyasî ya xelet, bi kurdan dest pê nekiriye û ne îcada wan e. Dema ku di vê çarçovê de em li pratîka Rusyayê binihêrin; Stalîn, ji bo ku bi tevayî desthelatdariyê bidest bixîne, hemû endamên polîtîkî bûroya Lenîn û bi sedhezaran şoreşgerên rusî bi ajaniya împeryalîzmê suçdar dike û wan dike. Heman tişt li Çînê û gelk ciyên din jî pêk hatiye.

Bûyera Kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan jî, ji alîgir û hevalbendên her du grûban bêtir, di nav siyaseta kurd de pêşiya rê û rêbazeke nû vekir; ku grûbên cûda yan jî di nav heman grûbê de fikrên ciyawaz û têkiliyên bi mihalefetê re, bi rê û rêbaza tundrewî bête çareserîkin. Vê jî di nav rêxistinê de tunekirin an kuştina reqîban peyda kiriye, bikaranîna rêbaza demokratî jî holê rakiriye. Ev jî, bûye yek ji sedemê peydabûna fehma siyaseta komplocîtîyê di nav siyaset û rêxistinên kurdî de.

Heta ku em xwe ji fehma siyaseta komplocîtî û xwepêrest xelas nekin, mimkun e ku bûyerên wisa her bi serê me de werin

û têne jî. Ji ber vê yekê, da ku bûyerên wisa dubare nebin û berdeham nekin, divê perdeya li ser wan rabe ku ji aliyê civakê ve rast bêne têgehiştin. Di vê çarçovê de, lêkolîn û lêgerîna li ser bûyera her du Seîdan û derxistina rastiya wê wezîfeya her kurdekî ye û heta wezîfeyeke derengmayî ye. Ji ber vê yekê, munaqêşe û ronîkirina bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan, her çî qas dereng ketibe jî, li gor me hewldaneke pozîtîv û pêwîst e. Tevger û kadroyên netewî, bi ronîkirin û ders jê wergirtina bûyerên dîrokî û rojane dikarin pêş bikevin.

Rêbaza lêkolîna me ya li ser vê bûyera trajedîk ev e, ku em lênêrin û têgehiştina şahidên vê bûyerê dîyar bikin, ne ku her tişt bi aşkerekirina aliyê wî yê edlî(dadî) ve girêbidin. Ez nabêjim aşkerekirina aliyê wî yê edlî ne girîng e. Digel vê, aliyê herî girîng ê bûyerê, têgehiştin û dîyarkirina fehm û lênêrîna di mejîyê Dr. Şivan û hevalên wî de ye, ji ber çî sedeman dibe bila bibe, têgehiştina Dr. Şivan bûye teşwîqkarê bingeîn ê vê bûyerê.

Ji bo vê yekê, me ji kesên di radeya yekemîn de girêdayîyê bûyerê xwestiye ku ji dûrî şiroveyên xwe yên subjektîv, rastiya bûyerê çî ye, wê bo me bînin ziman. Mimkun e ku ji herdu aliyên jî, tu kesek bi serê xwe tevayîya bûyerê nizanibe, lêbelê ku her kes ji aliyê xwe ve wêneyê pê dizane dîyar bike, dê bi giştî tablo jî dîyar bibe. Derxistin û zelalkirina rastiya bûyerê, ji bo hemû aliyên berpirsariyeke dîrokî û netewî ye.

Bi tevî ku di ser bûyerê re 34 sal derbas bûye, hîn jî hemû kes û aliyên bi bûyerê ve girêdayî, naxwazin bipeyvin û agahdarî û belgeyên ber destê xwe bi me re parve nakin. Bi taybetî ji aliyê Dr. Şivan de gotin û dîtînen Soro(Nazmî Balkaş), Zendo (Abdulkerim Ceylan) û Kurdo(Ömer Çetîn) pîrr girîng in. Heman demê agahdariyên Feqî Huseyn jî girîng in. Mixabin vê gavê ji van şahid û unsûrên bûyerê Soro, Zendo û Feqî Huseyn çûne ser heqîya xwe. Ji aliyê Dr. Şivan ve tenê Kurdo li jiyane ye. Dema ku me di kovara WARê de dosyaya bûyera kuştina Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan amade kir, Soro û Feqî Huseyn li jiyane bûn. Di serî de ez bi xwe û gelek heval û dostên din ji wan (Omer Çetîn jî di nav de) xwestin ku agahdariyên xwe yên derbarê vê bûyerê binivîsin, lê hezar mixabin wan deng ji xwe derneanî. Omer Çetîn, pêşiyê ji min re got ku "Derwêşê Sado binivîsîne û ez nivîsa wî bixwînim,

ez jî dinivîsînim." Bi tevî ku nivîsa Derwêşê Sado gehiştê ber destê Omer Çetîn, dîsa wî deng ji xwe derneanî. Di hevdîtina me ya dawî de tiştê ku ji me ra got ev bû: "Heta nûha di derbarê vê bûyerê de deng ji hevalên min ên li Awrupayê derneketiye, ez naxwazim tenê bi serê xwe binivîsînim". Her weha Soro û Feqî Huseyn jî nenivîsandin, ta ku çûn rehma xwedê. Eger di ber destê zarokên wan de li ser vê bûyerê tiştên nivîsandî hebin, ez hêvî dikim ku rayagiştî ya kurd agadar bikin û wan belge û nivîsan bidine çapkirinê.

Ez bawer dikim ku belge û daxuyaniyên di nav vê pirtûkê de, kêm-zêde dê gelek aliyên vê bûyerê bo me ronî bikin. Derbarê sedem û encama vê bûyerê de, ew pirsra ku Şakir Epozdemîr li xwe dike, bi rastî pirsra gelek mirovan e û pirsra her kurdekî ye, ku Kek Şakir dibêje: "*Gelo çewa Dr. Şivan vê xetayê kir, bi çi eqilî û ji bo çi?*". Bi îhtimaleke mezin dema îfadegirtinê jî ev pirs jê hatiye pirsîn û Dr. Şivan di îfadeya xwe de weha bersiva wê dide:

Parta me li gora sîstema merkezî dixebite(Md. 4 nîzamnemeya navxwe PDK-T). Li gora Md. 14 benda f jî, karbidestên partî dikarin cezaya xiyaretê bidin û tenfîz bikin.

Piştî mehkemekirina Seîd Elçî û Mihemedê Begê, karbidestên parta me, li ser delîl û îtirafên herduyan bawerî anî ku ev her du mirov xayinê milletê kurd û Şorişa Kurdistanê ne û digel Emna Tirkan ji bona pûçkirin û kuştina me xebatê dikin û ji bona hindê wezîfe ji wan re hatiye dayin.

Li ser vê bawerî û qeneeta karbidestan, sikreterê tevayî Ferîdûn û sikreterê dudu Gavan bi hev re ji bona tenfîzkirina sûcê xiyaretê emir dane sê endamên partî û ev emir hat tenfîzkirin.

..... Û heqê me heye ku em wek şorişgerek hevalên we, dostên we û di bin xizmeta Şoriş de û li ser tayinkirina karbidestên Şoriş daxwaz dikin ku li vê xeletiya me biborin. Ji ber ku di manayê bingehîn û li beranberê Şoriş û PDK de çi sûcê me nîne.(Şervan Bûyûkkaya, Ilk Anlatum).

Ev belge, yekemîn belge ye ku di derbarê bûyerê de rasterast gotin û lînêrîna Dr. Şivan û hevalên wî dîyar dike. Mimkun e ku hinek kes li ser rastiya vê belgeya li jorê, biguman bin. Ji ber vê, divê qeneeta rastiya li ser vê belgeyê dîyar be. Sîyasetmedar û

lêkolîner Seîd Aydogmuş, ku digel çend kesên din yek ji tenzîmk-
er û lêkolînerê van belgeyan e û di derheqa vê de weha dibêje:

*"Ez jî di nav de em grûbek sîyasetmedar û lêkolînerên kurd, bi
destûr û alîkariya Şervan Bûyûkkaya li ser van belgeyan
lêkolîn kir û wan bi nivîsên din ên Dr. Şivan û Soro re rûberê
hev kirin. Li dawiyê bi îtîfaq em gihîştin vê encamê ku ev belge
aîdê şexsên navborî ne."*

Em dîsan li bersiva hinek pirsan bigerin, gelo têgehîştina
fehma sîyasî û rixistinî ya Dr. Şivan çi bû? Û çi qas tesîra wê têge-
hîştinê û çi qas tesîra rewşa sîyasî ya herêmî û navnetwî ya wê
gavê li ser pêkhatina vê bûyerê hebû? Yan jî her wekî ku hinek
kes dibêjin "di çarçova şerê sar ê dijî kominîzmê de, operasyona
kedîkirina sosyalîstên kurd bû"? Meriv dikare pirsên wisa gelek
zêde bike. Dema ku ew belge û hevpeyvînên di nava vê pirtûkê
de bêne xwendin, ez bawer dikim xwendavan bi xwe dê bersîva
gelek pirsan bibîne. Li gor dîtina min, tiştê ku Dr. Şivan teşwîqê
vê yekê kiriye, digel xusûsiyetên wî yên şexsî, têgehîştina wî ya
sîyasî û rêxistinî ye. Ev têgehîştin; li ser bingeha fehma rêxistina
navendî ya otorîter, xweperest û komplocîtîyê çêbûye.

Ji bo bihêzkirina van xusûsiyetan gelek gotar û tetbîqên Dr.
Şivan hene. Ş. Epozdemîr dibêje, dema ku em li hepisxanê bûn,
Dr. Şivan di nav hevalên xwe de propagandeyeke wisa belav dike
û dibêje

*"PDKT, wê referans bide me û em ê derbazî Başûr bibin, li wir
cî bigrin, kadroyên profesyonel perwerde bikin û partiya Seîd
Elçî fesih bikin, partiyek nûh saz bikin û riya micadeleyê di rêx-
istînek xweser a kurdî da bajon."*

Li ser vê yekê, mînakeke din jî Seîd Aydogmuş weha tîne
ziman: "Qasê ku ez dizanim, lêkolîner û nivîskarekî nasyar ji bo
wezîfeyeke belîkirî dibe endamê partiyê, piştî ku bi taybetî li ser
hinek babetên îdeolojîk û polîtîk cûdahiya lînêrîna xwe dîyar
dike û vê li dervayê partiyê jî tîne ziaman, bi rêbazeke balkêş
tête teswîyekirin ku Şivan ji wî re dibêje: ji ber ku partî fesih
bûye wezîfa we jî xelas bûye!" Wekî din jî em dikarin van

mînakan zêdetir bikin, lê îcab nake, hunê di nav rûpelên vê xebatê de van mînakan bibînin.

Tetbîqên rêxistinî yên Şivan û encamê ku jê têne derxistin, bûne çavkaniya fehma komplocîtiya Şivan. Di vî çarçovê de, li ser xebata pratîk a rêxistinî ya Dr. Şivan, Îbrahîm Gûçlû weha dibêje:

"Dema ku xebata Dr. Şivan a wê demê bê lêkolîn û şirovekirin du-sê xalên girîng tên holê: 1. Dr. Şivan, ji bona ku qadroyan bikişîne nav xebata xwe, gelek qadroyên siyasî tehdît kirine û zor daye wan. 2. Dr. Şivan, gelek kesên li dijî hevûdu di xebat û rêxistina xwe de rêxistiye û gihandiye hev. Van kesan jî, ji hevûdu agahdar nekiriye. Ji bona wê jî, dema ku li hin ciyan ew rastîya derketiye holê, beşek kes ji berporsiyariyê bi awayekê jakobenî dûr xistiye û komîte fesih kiriye. 3. Dr. Şivan, gelek qadro, endam û berporsiyarên Partiya Demokrat a Kurdîstana Tirkîyeyê, hevalên Seîd Elçî bi rê xistine, bi grûba xwe re hevgirêdana wan pêk aniye. Îzin daye, ku endametiya wan jî dualî dom bike."

Dema ku feraset û têgeyîştina te ya sîyasî û rêxistinî ev be, niyeta te çi qas baş dibe bila bibe, ji dervayê nîyeta te pêkhatina bûyerên wisa mîsoger e. Di encamê de, bûyerên wisa li ser civakê gelek tesîrên neyînî dikin. Ş. Epozdemîr, wê encama neyînî wisa tîne ziman *"li gor dîtina min; vê bûyerê, hem pêşiya her du Seîdan û partiyên wan xetîmand, heman demê, terza tekoşîna netewî û demokratî ya gelê me jî şaş kir."*

Di encamê de dixwazim li ser hevpeyvîn û belgeyên di nav vê pirtûkê de çend gotinan bêjim: ew hevpeyvînên di nav rûpelên vê pirtûkê de, qismek ji wan, di kovara *Warê* de hatibûn çapkirin û yên din heta nûha ne hatine çapkirin. Hevpeyvînên digel Mela Hemdî û Remezanê Îsa cara yekemîn e têne çapkirin.

Ewên ku keda wan di vê xebatê de heye, bi taybetî Roşan Lezgîn ku di vê germa havîna Diyarbekirê de ji bo redaktekirina vê pirtûkê gelek zehmet xwar û Lûtfî Baksî û Nacî Kutlay jî, ji bo bidestxistina hinek wêneyan zehmet dîtî, bo wan hemiyar gelek sipas dikim.

Faîq Bucak

(1919-5 Temmuz 1966)

Faîq BUCAK yek ji serokên tevgera netewî ya kurd e û her çi qas helbestên wî wekî pirtûkek nehatibin çapkirin jî, heman demê helbestvanekî wekî Tagor e, ku di helbestên (şîrên) xwe de felsefa xwe dihone. Bêşik çavkaniya ev terzê helbestvaniya wî, bi giştî xwe dispêre çanda gelêrî ya kurd û bi taybetî jî aliyê wî yê folklorîk.

Di sala 1919 de li gundê Hadro ya Soregê ji dayik bûye. Perwerdeyiya seretayî li Soregê temam kiriye, ya nevendî û lîseyê



jî, li Ruhayê dest pê kirîye û li Dîyarbekir temam kiriye. Di sala 1939an de li Unîversîta Îstenbolê di Kullyeya Hiqûqê de qeyd bû. Di salên xwendina xwe ya Îstenbolê de digel xalê xwe Mistefa

Remzî Bucak, Yusiv Ezîzoxlu, Musa Anter ji bo xwendevanên kurd Nivîngeha Xwendevanên Dîclê dadimezrînin. Di dema xwendekariya xwe de li Îstenbolê pêşkêşîya sazkirina "Şevbi-hûrkên Rojhilat"ê dike û di van şahiyên de sergovendîyek navdar bû.

Faîq Bucak, di jîyana xwe ya civakî de pir çalak bû û ji ber helwêsta xwe ya li dijî neheqî û rêbaza têkoşîna wî, di nav hevalên xwe de bi navê Gandî hatibû navkirin. "Mînak, ku di Yurdê (Nivîngehê) de jilêt nedîta rihê xwe dirêj dikir, xwarin tunebûya rojî digirt, kitêba wî ya dersê tunebûya destnivîs digirt. Ev hemî tiştan ji xwe re nedikir xem, nedibû xemxurê şexsê xwe, lêbelê di jîyana xwe de ji bo bi mîlyonan însanên weha xemxur bû."

Piştî ku di sala 1946an de Kullyeya Hîqûqê xelas dike, demekê hakimî dike û di sala 1965an de îstifa dike û li Ruhayê dest bi Parêzvanîyê dike. Piştî Derba Ekserî ya 27ê Gulanê bi tevî gelek rewşenbîr û giregirên kurd ji bo Sêwasê hate nefî(sirgûn)kirin û ji wê derê jî wî şandin Balixkesîrê. Piştî ku ji sirgûnê vegerya, di hîlbijardinên sala 1965an de bû bernamzedê parlemenî di Partiya Edalet de, lêbelê namzediya wî hate redkirin û ew jî wek namzedekî serbixwe tevî hîlbijardina parlemenî bû û kar nekir.

Di sala 1958an de vegera Mistefa BARZANÎ ji Sovyetê, bû sedemê belavbûna pêlek netewî li her derê Kurdistanê. Bi tevî hemû xwînrijî, zilm, zordarî û xofa dewleta tirk ku li ser civaka kurd pêk anîbû, ji ber wê pêla netewî, li bakurê Kurdistanê jî liv û tevgereke kurdperwer dest pê kiribû. Bi teşwîq û hewildana Fehmî Bîlal(Firat) jî, di 11yê Temûza sala 1965ê de pênc heval (Seîd Elçî, Dûrnas, Derwêşê Sado, Şakir Epözdemir, Omer Turhan), *Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê* dadimezrînin. Fehmî Bîlal ji ber nexweşî û pîrbûna xwe, di nav rêza damezrêneran de cî nagre. Her weha Faîq Bucak û Kemal Badillî jî, ji vê pêvajoyê agadar in. Seîd Elçî, yekemîn sekreterê giştî yê Partiyê tête hîlbijardin. Di amadekirina bername û nîzamnâmê de bi hev re dixebitin.

Faîq Bucak, di bîr û bawerîyên xwe de zelal û xwedî şexsiyetek saxlem bû û di nav civata kurd de bi rêzdarî dihate pêşwazîkirin. Ji ber van xususiyetên xwe, ji bo Partiyê serokekî

îdeal dihat qebûl- kirin. Di destpêkê de ji ber sedemê nehazir-
bûniyê, vê teklîfê, du caran red dike. Ji bo îqnakirina wî, Fehmî
Bîlal du caran diçe Ruhayê, mala wî. Piştî ku Faîq Bucak
damezrênerî qebûl dike, ji nû ve li ser bername û nîzamnemeyê
dixebitin. Li ser daxwaza Faîq Bucak, di bername û nîzamnemeyê
de hinek guhartin çêdibin. Pêşgotina Partiyê di wê
xebatê de li ser bernameyê tête zêde- kirin. Faîq Bucak, di 21ê
Tebaxa 1965 de li Dîyarbekirê di Otêla Turîstîk Palas de bi
sondxwarinê tevî Partiyê dibe û di heman civînê de Seîd Elçî
Serokatiya Giştî dewrê wî dike û bi xwe jî dibe sekreterê giştî.

Neh meh piştî damezerandina *Partiya Demokrat a
Kurdistana Tirkîyê*, di bihara 1966an de Serokê Giştî Faîq Bucak,
bi nameyek damezirandin û çalakkûna Partiyê bo Serokê Giştî yê
Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê (PDKI) Mistefa BARZANÎ
agadar dike. Barzanî, bersîvek nedaye vê nameyê.

Faîq BUCAK, di 5ê Temuza 1966ê de bi rênîşandan û plan-
danîna hêzên tarî ve ji aliyê xismên xwe ve tête gulebarankirin û
birîndar dibe. Lêbelê divê bête zanîn ku wê demê birîna wî ne
birîna mirinê bû. Li Ruhayê di xestexanê de bi dest û rêxistinkir-
rina hêzên tarî ve li xestexanê bi jehrdanê tête kuştin û digîje
merteba şehîdên berîya xwe.

Faîq Bucak dema ku hate şehîdkirin, zewicandî û bavê şeş
zarokan bû. Bi şehîdbûna Faîq BUCAK re, di rêvebiriya Partiyê
de valayiyek gewre çêbû. Lewra Faîq BUCAK, di nav civaka kurd
de merivekî pêbawer û rêzdar, netewî û şorişger dihate naskirin
û dikarî bi şexsiyeta xwe ya pêbawer, bi rêya xebata Partiyê di
nav- bera qirênê nû û rewşenbîrên netewî de pirek pêk bîne û
bi vê pirê xelkê kurd û qirênê nû bikşîne nav xebata netewî ya
Partiyê. Lê mixabin hêzên tarî û dilreş, emrê di vê rê de zû qut
kirin. Piştî şehîdbûna Faîq BUCAK, "Serokatiya Giştî" ji Partiyê
hate rakirin û Seîd ELÇÎ cardin bû Sekreterê Giştî yê Partiyê.

Faîq BUCAK di helbesteka xwe de rewşa civaka kurd weha
tîne ziman, gazindên xwe dike û dibêje:

“Ne nan e, ne dan e, ne şîv û taştê
Ho rebîyo! Ev qas derd û bela ji ku tê
Dewlemendî li me girt êdin em bûne xezan

Hiş serê me da nema, belê, mane gêj û nezan
Çavan jî bigre bila rohnayî bibe zulmet
Çi bikim pişka derd û xeman para me ket
Ma nifir li me bûye, kes pîgar nabe me ra
Heval silav nadin, pirs nakin bav û bira
Rê li ber me wunda bû nizamim kuda biçim
Rebî' tîna becîm sekinîne li ber çem.

Sonda me mirin e di riya te da welat
Kefen e kirasê me, ferman jî xeml û xelat
Xêr ji mirinê dinê da bo me tune ye xebat
Emê xwîna xwe bifroşin pê bikirin Kurdistan

Em bi lorika mirinê hatine pêçandin
Dinya şûna şîr da em bi xwînê mijandin
Em dîlîtiyê naxwazin, pir rûmet e goristan
Em ê xwîna xwe bifiroşin pê bikirin Kurdistan.”


Seîd ELÇÎ

(1925-1ê Hezîrana 1971)

Seîd ELÇÎ yek ji serok û pêşengên tevgera kurdî ya dema xwe bû. Di sala 1925an de li Çewlîgê di gundê Zeynebê de ji dayik bûye. Ji giregirê malbata Elçîyan kurê Zûfûr Beg e. Seîd Elçî dibistana sere-tayî li gundê xwe dixwîne û ji bo xwendina dibis-tana navendî dixwaze here bajarê Erzromê, lêbelê bavê wî naxwaze biçe û jê re dibe asteng.

Piştî ku ji ekserîyê vedigere, digel Emîn Elçî dixwazin rêxistina *Partî Demokrat (DP)* li Çewlîgê damezrînin. Piştî wî diçe

Îstebolê û li Kitêbxaneyê Asrê Îlmiye de dest bi xebatê dike. Li wê derê bi hewldana xwe hîne meslega mihasebecîtiyê dibe û êdî debara xwe ya aborîyê bi vê pîşeyê didomîne.



Çûyina wî ya Îstenbolê di jiyana wî ya siyasî de dibe destpêka qonaxeke nû; li wê derê bi gelek rewşenbîr û neteweparêzên kurdan re hevnasîn û têkiliya wî çê dibe. Ev dibe sedemê geşbûn û bihêzbûna pêjn û fikrên wî yên netewî û dest bi xwendin û lêkolîna pirsgirêka kurd û Kurdistanê dike. Di demek kurt de bi xebat û çalakîyên xwe di nav rêza pêşengên kurd de ciyê xwe girt. Di damezirandina nivînsgeha xwendevanên Bîngolê de (1959) gelek keda wî çêbû. Dema senatorê Nîgde yê wê demê Asim Erenî, Ji ber bûyerên Kerkûkê yên 1959an, pêşniyareke da Meclîsa Tirk, ku li hember kurdan "miqabeleyê bîlmislî" pêk bîne û digot "kurdan li Iraqê tirkmen qetil kirine, em jî li vê derê bi heman cûre kurdan qetil bikin." Li ser vê yekê, li gelek ciyan xwendevan û ronakbîrên kurdan, ji bo rûşekirina vê lênêrîn û polîtîkaya şovenîst, daxuyanî dan û xwepêşandan saz kirin. Wê demê Seîd ELÇÎ yek ji rêber û rêxistinkerê van çalakîyan bû. Û di têlgirafa ku ji bo Asim Erenî birêkir de weha digot: *"Îro ku li her derê heq û hiqûqê mirovan derketiye pêş, tu kes nikare kurdan îmha bike. Vê yekê baş têxe mejiyê xwe yê kufikî!..."*

Di 17yê Kanûna 1959an de ji aliyê dewletê ve li ser rewşenbîrên kurdan operasyoneke gewre pêk hat. Seîd ELÇÎ, di vê operasyonê de jî bi tevî 50î rewşenbîrên kurd hate girtin û li hepisxaneyê Herbiyeyê hate hepisikirin. Yek ji hevalên wan wendevanê Zanîngeha Hiqûq a Anqerê Emîn Batu (ji Mêrdînê bû), di zindana Herbiyê de mir û hejmara girtîyan daket 49 kesan, ku ev bûyer jî pişt re bi navê "Doza 49an" hate navkirin û bîranîn. Di vî tewqîfatê de bi tevî ku siheta wî nebaş bû jî, 129 rojan li hucreyên zîndanê de ma û li dema dadgehîkirinê parastina kurd û Kurdistanê kir. Ev helwesta wî ji aliyê her kesî ve hate teqdirkirin û dev bi dev belav bû. Ev helwesta wî bû sedemê vê yekê, ku navê Seîd ELÇÎ, di nav rêza girtiyên berxwedêr de derkeve pêş. Seîd ELÇÎ û hevalê wî Av. Zîya Şerefhanoglu di sala 1963an de, amadekariya derxistina kovarek bi navê *Rêya Rast* dikin. Lêbelê ji ber bûyerên 21ê Gulanê ûrfî îdare tête îlankirin û Seîd ELÇÎ û 22 havalên xwe cardin tên girtin.

Piştî ku di sala 1964an de ji hepsê derket, li Diyarbekirê bicî bû. Di sala 1965an de bi teşwîqa Fehmî Bîlal, digel pênc hevalên xwe di 11yê Temuza 1965ê de *Partîya Demokrat a Kurdistan*

Tirkiyê damezirandin û ji bo serokatîya Partiyê Seîd ELÇÎ hate hîlbijardin. Damezrênerên Partî: SEKRETER PÊŞMERGEYÊ WELAT (Seîd ELÇÎ), MIHASIB EVÎNDARÊ WELAT (ŞAKÝR EPÖZDEMÝR), Aza DÛRNAS(Av. Ş. E.), Aza JÎREK(DERVÝŞ AKGÛL), BENDEYÊ WELAT(ÖMER TURHAN).

Dema ku Faîq BUCAK tevî Partiyê bû, wek serokê PDKT hate hîlbijardin û Seîd Elçî bû sekreter. Piştî ku Faîq BUCAK hate kuştin(di 5ê Temuza 1966ê de), S. ELÇÎ cardin bû Sekreterê Giştî yê PDKT.

Di sala 1967ê de li Diyarbekir, Silvan, Batman û Soregê çendek mitîng ji aliyê TÎP û endamên PDKT ve hatin sazkirin, ku ev mitîng bi navê "Mitîngên Rojhelatê" dihatin navkirin. S. ELÇÎ û hevalên xwe jî di pêkanîn û rêxistinkirina van mitîngan de rolekî aktîv leyiztî û ew bi xwe, yek ji axavtvan û xetîbê ev mitîngan bû. Wî di hemû mitîngan de bi kurdî dest bi axavtina xwe dikir, bi gotar û xîtabetên xwe, pêjn û fikrên netewî yên beşdarvanan hişyar dikir û ji bo tekoşîna netewî halan dida wan.

Di 28ê Kanûna 1968an de ji aliyê dewletê ve operasyonê li ser PDKT hete kirin û 16 hîmdar û endamên partiyê hatin girtin. Di van operasyonan de destûrname û bernameya Partiyê jî hatin bidestxistin. Di encama operasyonê de S. ELÇÎ û hevalên xwe bi minasebeta damezrandin û rêvebirina PDKT hatin girtin û hepis kirin. Dewleta Tirk nedixwest kadroyên PDKT li Diyarbekirê mehkeme bike, ji ber vê yekê bi minasebeta "asayîşê" wan bi rê kirin bo mehkemeya bajarê Antalyayê. S. ELÇÎ û hevalên xwe li wê mehkemê bi îddîa "damezrandin û rêvebirina PDKT" hatin mehkemekirin û bo wan cezayên giran dihate xwestin. Di vê mehkemê de Seîd ELÇÎ û hinek hevalên xwe parastina sîyasî ya partiya xwe dikin û di encamê de salek ceza didin. Têkiliyên Dr. Şivan û S. ELÇÎ di vê pêvajoyê de bêtir nêzîkê hev dibin û Dr. Şivan gelek caran diçe hevdiştina wî li hepisxaneyê Antalyayê. Pêşiyê di 27 îlona 1968ê de şeş hevalên wan: Zubeyr Yildirim, Şûkrî Alpergîn, Nezir Aydın, Abdurrahman Uçaman, Mehmed Sidîq Gul û Şemsî Ardiçlî tehliye dibin û di 25ê Sibata sala 1969ê de jî ceza S. ELÇÎ, Derwêşê Sado, Şakir Epozdemîr, Omer Turhan û Şefîq Issî xilas dibe û bi tevî hevalên xwe tehliye dibe.

Di heman salê de bi armanca perwerdekirina kadroyên nû,

Dr. Şivan û hinek hevalên wî bi navê Partiyê bi rê dike bo Kurdistana Başûr. Dr. Şivan li vê derê bê agadariya wî partiyekî nû dadimezrîne. Ev bûyer dibe sedemê jihevûn û qutbûna têkiliyan. Seîd ELÇÎ, ji bo ku di derbarê vê rewşê de agadarî bide Serok BARZANÎ, di 15yê Gulana 1971ê de berê xwe dide herêma Kurdistana "xudmuxtar/otonom". S. ELÇÎ, beriya ku biçê qerargeha serok BARZANÎ, li Zaxoyê di mêvanxaneyê Partiyê de 2-3 roj bi mêvanî dimîne û cara dawî şertên hevdîtina wî û Dr. Şivan pêk tê. S. ELÇÎ, bi tevî hevalên Dr. Şivan; Çeko û Birusk, ji Zaxoyê bi land roverek bi rê dikevin û têne heta ber çemê Hêzilê. Li vê derê, piştî mînaqêşe û gengeşiyên dûr û dirêj, ew û Şivan lihev nakin. Seîd ELÇÎ û hevalê wî Mihemedê Begê di roja 1ê Hezîrana 1971ê de ji aliyê Dr. Şivan û hevalên wî ve têne kuştin.

Dr. Şivan


(Said KIRMIZITOPRAK)

(1935-26ê Sermawêz 1971)

Dr. Şivan(Said KIRMIZITOPRAK), di nav têkoşîna Tevgera Netewî ya Kurd a salên 1960-70ê de xwedî ciyekî girîng e. Ew di sala 1935an de li gundê Cîwarik ji dayik bûye. Gundê Cîwarik (Sariyayla(tr.)) bi qeza Nazmiye ya Dêrsimê ve girêdayî ye. Navê bavê wî Abbas û ya diya wî jî Zuhre ye.

Dr. Şivan xwendina seretayî li Nazmiyê û ya navendî jî di dibistana nivîngehî ya Balixkesîrê dixwîne. Di sala 1956an

de li Unîversîteya Îstenbolê dest bi xwendina Fakulteya Tibbiyeyê dike û her weha li wê salê jî dizewice.



Di sala 1959an de, li ser bûyerên Kerkûkê, senatorê bajarê Nîgde yê wê demê Asim Eren, li ser bûyerên Kerkûkê pêşniyarek dabû Meclîsa Tirkî, ku li hember kurdan "miqabeleyê bîlmislî" pêk bîne û digot "kurdan li Iraqê tirkmen qetil kirine, em jî li vê derê bi heman cûre kurdan qetil bikin." Li ser vê daxuyanî û sîyaseta şovenîst, ronakbîr û xwendevanên kurd ên li Îstebolê, dest bi çalakiyên şermezarkirinê kirin. Wê demê Dr. Şivan yek ji serkêşên van çalakiyan bû. Di meha Sermawêza heman salê de operasyonek li ser ronakbîr û welatparêzên kurd ên li Diyarbakir, Îstebol û Anqerê tête kirin. Di encama vê operasyonê de 50î kes têne girtin. Di zindanê de xwendevanê Zanîngeha Hiqûq a Anqerê Emîn Batu(ji Mêrdînê bû) dimire û yên girtî dimînin 49 kes. Ji ber vê yekê, ev bûyer bi navê "Doza 49an" derbasê lîterator û dîroka nêzîk a kurd bûye. Di encamê de ev 49 kes li hepisxaneyê Herbiyê de hatin hepisandin. Dr. Şivan yek ji wan girtiyan bû û piştî ku hatin berdan wî sirgûnî Îspartayê kirin.

Piştî darbeya ekserî ya sala 1960î, peyderpey kovarên çepgir dest bi weşanê kirin. Yek ji wan jî kovara "Yön" bû, Dr. Şivan bûbû nivîskarê wî yê berdewamî. Bi tevî faalîyeta nivîskariyê, xwendina xwe ya Tibbiyeyê di sala 1962an xelas kir û li bajarê Îspartayê dest bi bijîşkî kir. Heman demê tîkiliyên xwe yên sîyasî bi kurdên endamê TÎPê(Partiya Karkerên Tirkîyê) re germ kirin.

Li gor pasaporta wî, di sala 1968an de carek çûye Yûnanîstanê û li gor belgeyêke din ku heman salî sefaretê Fransayê jê re şandiye, di 1968an de çûye Beyrûdê.

Dema ku Seîd ELÇÎ û hevalên xwe li hepisxaneyê Antalyayê girtî bûn, Dr. Şivan di vê pêvajoyê de gelek caran diçe hevdiştina wî û tîkiliyên her du Seîdan germ û geş dibin. Piştî ev tîkiliyên germ û gengeşiyên dûr û dirêj, ji bo xebateke yekgirtî û perwerdekirina kadroyên têgehiştî û çalak, bi referansa Seîd ELÇÎ û Partiya wî, di 4ê Tîşrîna Pêşîn a sala 1969an de Dr. Şivan û hevalên wî [Çeko (Hikmet Buluttekîn), Brusk(Hasan Yikilmiş), Soro(Nazmî Balkaş) û Faîk Savaş] derbasê Kurdistanê Başûr dibin. Dr. Şivan li wê derê hem bi dîktoriya xwe xizmeta Şorîşê dike û hem jî faalîyeta xwe ya sîyasî didomîne. Di vê pêvajoyê de bi minasebeta tîkiliyên sîyasî û rêxistinî, Dr. Şivan gelek car der-

basî Tirkîyê dibe û cardin vedigere. Di encama xebat û lêkolîneke kurt de, di 27ê Hezîrana 1970ê de li Anqerê, li "Gazî Mahallesî" bi tevî 17 hevalên xwe *Partiya Demokrat a Kurdistanê li Tirkîyê*(PDK-T) dadimezrînîn û Dr. Şivan bi xwe jî dibe sekreterê vê partiyê. Piştî vê, têkiliyên Dr. Şivan û S. ELÇÎ ber bi têkçûnê ve diçin.

Dr. Şivan bi aktîvî û hêza xwe ya îqnakirinê, di demek kurt de ji bo partiya xwe gelek hevalbendan çêdike. Seîd ELÇÎ, ji bo ku BARZANÎ di derbarê têkiliya Partiya xwe û rewşa Şivan de agadar bike, diçe Kurdistana Başûr. Dr. Şivan ji vê hewldanê agadar dibe û dema ku S.ELÇÎ li Zaxoyê dimîne, wî bi riya hevalên xwe (Çeko û Birusk) vedixîne bo qempê. Di encama mînaqêşeyê tund û dirêj de li hev nakin, Seîd ELÇÎ û hevalê wî Mihemedê Begê ji aliyê Dr. Şivan û hevalên wî ve têne înfazkirin. Piştî ku ev bûyera trajîk dertê holê, li ser daxwaz û taqîbata PDKT jî, Dr. Şivan û hevalên wî ji aliyê rêvebirên Şorişê ve têne mehke-mekirin û bi aşkerabûna bûyerê, bo wan ceza mirinê tete dayin û di 26ê Sermawêza 1971ê de têne înfazkirin.

Çavkanî:

- Kovara *Deng*, hej. 2, 1963, weşanên Apec, Stockholm/1998
- *Sosyalizm ve Toplusal Kurtuluş Mücadeleleri* Ansiklopedisi (Ansiklopediya Sosyalizm û Tekoşîna Rizgariya Civakî)
- Malmîsanij & Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî(1908-1992)*
- Mahmûd Lewendî, *Çira*,Kovara Kulturî(Kovara Komeleyên Kurd li Swêdê) hejmar: 8, Zivistan 1996

**Di DÎROKA ME YA NÊZÎK DA
BÛYEREK GIRÎNG :
BÛYERA KUŞTINA SEÎD ELÇÎ û Dr. ŞIVAN
(01. Hezîran 1971)**

ŞAKÎR EPÖZDEMİR

27 sal di ser vê bûyera çepel û dijwar da derbaz bû. Qetilkirina Seîd Elçî û hevalê wî Mihemedê Begê di sala 1971-ê da şoqek mezin xwiliqand û serê hemî Kurdên weLatperwer tevlihev kir. Her wisa girtin, mehkemekirin û înfazkirina Dr. Şivan. Çeko û Birûsk jî gelek serê Kurdan tevlihev kiriye. Di derheqa vê bûyerê da kêmtîşt têtê zanîn û di derheqa qewimîna vê bûyerê de kêmtîşt hin tiştan dizanîn. Ji ber ku ev pirs-girêk nehat zelalkirin, bi salan ma tabû. Ji ber ku kesî rastî nego, an hisaba kesî nehat ku li rastiyê bigere.



Şakîr Epözdemir

Erê, "Rastî tal e". Rastî tal be jî divê bê gotin. Emê niha perde rakin û bûyera Seîd Elçî û Dr. Sivan ya ku sala 1971-ê qewimî, bidin ber çavên xwendevanan. Hîvîdarim ku ji bo me Kurdan ev bûyer wê bibe ders, bibe eqil û tecrûbe.

Mêhvanê me yê ku di dereca yekemîn da, yek ji şahidê zinde yê vê meselê ye, Şakîr Epözdemir e.

Kek Şakîr, di sala 1938-a da li navça Bayikan, li nehiya Minar hatiye dinê. Temenê xwe 20 sal li gund, 10 sal li Diyarbekir, 15 sal li Tetwan û evan 15 salên dawî li Enqerê derbaz kiriye. Li gor gotina wî,

bi t kil  u p şniyaziya Œ.E. ketiye nava xebata partiy ; b ye dameziren r u endam  koma navkom.

Ev berpirsariya w  ya part  u endamiya w  ya koma navkom, heya Tebaxa Sala 1971  dajo. Teqr ben di xilasiya v  heyv  da xwe bi xwe biryar dide ku siyaset  terk bike. Ji w  roj  u p da di t  r xistinana da c  nagirtiye.

Damezirandina "Partiya Demokrat a Kurd stana Tirkiy "

WAR: Kek Œakir, ji kerema xwe ra hun dikarin bi kurt  bahsa damezirandina Partiy  (PDKT) u xebat n xwe y n destp k  bikin ?

Œ. Ep: -"Roja 11  T rmeh  sala 1965-an me 5 kesan, li D yarbekir, KoŒka Gaz  li bin  dar ka mezin a  inar  sond xwar u Partiya Demokrat a Kurd stana Tirkiy  dan . Em 5 kes evan b n: 1- Se d El i(Serok), 2- D rnas (Sekretar), 3- Œakir Ep zdemir (M hasip) 4- Derv Œ Akg l (Aza) 5-  mer T rhan (Aza).

Roja 23 y  T rmeh , d sa li Amed , li Ot la T r stik  me civ nek   kir u rehmetiy  Fa q B caq da sond , an  partiy . Fa q B caq b  Serok  Part  u D rnas, ciy  xwe da Se d El i... P Œgotina Program u N zaninama PDKT y  Fa q B caq niv s  u ev bernavk n han  ketin  bin  program :

Zinar: (Serok), P Œmergey  Welat: (Sekreter), Ev ndar  Welat: (Muhasib) D rnas (Aza), J rek (Aza), Bendey  Welat (Aza). Ev 6 kes heya Qongra PDKT'y  ya yekem n u 1973'yan di ciy  xwe da man. Jiber ku damezrandok n Part  ev kes in, div  heta hetay  d sa ev kes bin. Lewra Part  car k t  dan n.

Di sala 1966-an, heyya T rmeh  da Fa q B caq hat kuŒtin. Ji vir p de serokatiya partiy  hat rakirin u me ten  bi sekreteriy  partiy  meŒand.

Ji roja tes sa (damezirandina) part  u p da me dest bi xebat  kir. Li piraniya welat me x m  partiy  av t. Xebata me ya xwurt di payiza 1967-an desp  kir. Di v  war  da "DOĐU KALKINMA MITING-LERI" j  pir feydey k h ja da me. PDKT y , her end illegal b , bel  ronekb r n Kurd p  dihesiyan. Ji ber v  ronekb r n  ep, xwestin ku partiy k alternat f dan n. Di sala 1966-an da "Partiya Demokrat a Kurd n Tirkiy " dan n u belavok k weŒandin, bel  nekar n bibin ser .

Mîtîngên 1967 an, Girtin û Sûrgin (nefi) Kirina Seid Elçî

Sala 1967an salekê dîrokî ye û di dîroka Kurdên Tirkiyê da ciyê vê salê pir girîng e. Herkesî xwe di neynika meydanên mîtîngan da dît. Em PDKT yê jî bi xwe hesiyan ku ev potansyela Kurd divê bi zûyî va bê honandin û tenzîmkirin. Seîd Elçî di mîtînga Diyarbekir de hat girtin û wî şandina sirgûna 49-an ku diva vê sirgûnê li Kutahya biboranda. Şol kete ser milê min, Emer û Derwêş. Di wê navê da Partiya Kurdên Sûriye, ya Hemîdê Hacî Derwêş û Cjgerxwîn, em dawetê, kongra partiya xwe kirin. Emer û hinek endam çûn li vê kongrê beşdar bûn. Kongra PDKS qerar da ku di hemî delavî da me destek bike, ji me ra kadro rêke û tenzîma partiya me bi rêk û pêk bîne ser hev. Li ser vê, ji Suriyê Reşîdê Hemo hate Diyarbekir û me ji 15 ê heyva 12-an, sala 1967-an heya roja 19 heyva yekan a sala 1968-an xebat û tevgerê xurt ajot.

Operasyona Liser PDKT-ê

Manewiyata me gelek xwurt bû. Me teklîf dibira ba kî, ji me ra nedig- otin "na". Tam di vê niqteyê da MIT-ê operasyonêk giran li ser me pêk anî û li Amed, Batmanê, Tetwan û Patnos, Silwan, Qurtelan, Nisêbîn û Qiziltepê di şeva xwe da dor li me girtin. Destê girtinê danîne ser 16 kesan, belê 11 kes tewqîf kirin û avêtine hepsa Diyarbekirê. Em 5 roj li MIT-ê man, Partî deşîfre bû. Ewra û mohra Partî tev hatin girtin. Me morala xwe xira nekir û em sews nebûn. Beriya ku em bîn hizûra hakim, li emniyeta Diyarbekir me anîne cem hev. Seîd Elçî hê li Kutahyayê bû û Dervêş Akgul hê berdest nekiribûn. Ji komîta merkezî ez û rehmetiyê Emer bûn. Me biryar da ku emê Partî û programê partiyê biparêzin û bi vê partiyê îtiraf bikin û me wisa jî kir. Ew roj em 8 kes hatin tewqîfkirin û çend kes hatin berdan. Piştra Seîd Elçî ji Kutahya anîn, Derwêşê Sado û Zibeyr Axayê Omerî (Zubeyir Yıldırım) yê rehmetî jî anîn cem me.

Em 27.1.1968-ê hatin tewqîfkirin. 70-ê roj li Diyarbekir man. Piştî ku me birne Entelyê, zemanek dûr û dirêj me dernexistine mahkemê. Lê geriyan ku me nerm bikin û em parastinek siyasî nekin. Sawciyê Entelyê Ahmet Özsan vê teklîfê çend car anî ba rehmetiyê Seîd Elçî. Gava ku eqlê wan nebirî di 27.09.1968-ê da me deranîne mahkemê. Tam 8 heyvên me qediyabûn. Di vê mahkemê da 6 heval berdan, em 5 kes man girtî. Piştî vê celsê her heyv em derketin mahkemê û

25.02.1969-an da me jî berdan. Ev dawa dirêj bû geha 1974 an û kete ber efûya meşhûr a Bilend Ecewîd. Di vê navê da dawê çû DGM-a Îzmîrê, qerara paşî vê mahkemê da û em tev bi 3 sal hapis, 3 sal sirgûn ku ji aliyê mahkema Entelyê hatibûn cezakin; vê DGMa Îzmîrê 21.08.1974a xiste ber efûyê û teblixê me kir. Ezê rojhejmara dosya Entelyê* bidim; yê nê mereq dikin bila biçin li dosyayê binêrin. Lewra ez baş dizanim ka ev dosya çiq paqije.

S. VEROJ: *Birêz Ş. EP. ez dizanim; ev pirs, pîrsekê pîr zor e; belê bivê nevê wê ev pirs bê vekirin. Hûn di nava vê bûyera çewt û bê melêz da şahidêk zînde û bê teref in. Tû hevalê Seîd Elçî yî, lê Dr. Şivan û Çeko jî ne dîrê tene. Tû li pey şoparêça Seîd' e rehmêtî çûyî cem Dr. Şivan, li meqerê wî 20 roj mayî, di texliya meqer da, eşkerekirina bûyerê da, girtin û birina Dr. Şivan û hepiskirina wî û hevalên wî da, tû şahidêk zînde yî. Jibo eşkerekirina vê bûyera kanbax, û bi vê yekê ve girêdayî, jiber niyeta te ya paqij tû ketî rewşekî mûşkul. Çewa tê gotin ku, tû hem ji aliyê berpirsyarên PDK-ê va û hem ji aliyê hevalên Partiya xwe va xelet hatî famkirin. Li ser vê, serê te dikevê gêjiyê û dibe sebebê siyaset berdana te ku tû tûcar di tû rêxistinî da cî negrî. Vê qedexeyê jî, te bi xwe daye ser xwe. Ev daxwaza min û hemî welatperweran e, ku perde ji ser vê bûyerê rabî, me divê ku hûn bîranînên xwe yê nê di derheqa vê bûyerê de ji kerema xwe ra vekin.*

Ş. Ep.: Gelek spas dikim. Bi rastî vekirina vê pîrsgirêkê pîr zor e. Dibê "sotin nayê gotin". Vaye 32 sale Kurdan ciyê Faîq Bucak û 27 sale ciyê Seîd Elçî tijî nekirine. Çewa ku ciyê van pêşkêşan tijî nebûye, her wisa ciyê Dr. Şivan û Çeko jî nehatiye tijîkirin. Ew sekan in, sermiyan in, serek in, pêşkêş in û lîder in. Milet hero lîderan naxûlqînê. Heroj diyên me çok nadin erdê û lîderekan nayînin.

27 sal di ser vê bûyera kanbax da hat û bûhorî. Belê rojekê ku ez li ser vê bûyerê neponijim û neşewitim di ser min da neborî.

* Îzmîr DGM Esas No 1974/7, Karar No 1974/8 C. Savcısı EVRAK No: 1974/8

Çewa ku we emir kir, ez di nava merkeza bûyerê da bûm. Belê tû mecbûriyetekê ku Dr. Şivan Seîd Elçî qetil bike bi serê min nakevê.

Gelo bo çi ? Bo çi? û dîsa Bo çi? Ev pirs di mejiyê min da tim digere. Ez û hevalê Doqtor yê herî nêzik Soro, 30-40 roj li Hacûmranê li Otêlêk û di odeyêk da li cem hev razan. Min rojê çend car dipirsî "Gelo çewa Dr. Şivan vê xetayê kir, bi çi eqilî û ji bo çi?". Soro cewaba ku dida min, li xar û jor ev bû: "Wî werimandin, pihpihandin yanê bi tirkî (dolduruşa getirdiler)- gote ma hemî lîder dikûjin, ki ye ku nakûjê? Wî xapandin. Ew jî însane -wek ku dibên (beşer şaşar)- ma Şivan jî meriv e; insan şîrê xaf xwariye; lê diva ku vê xetayê nekira". Erê, bila Soro li qisûrê min mêze neke ku ez ji devê wî dinivsinim. Tiştê ku a niha dibêm, ev gotinên Soro di bîranînên Dr. Naci Kutlay' da derketine. Min ji Soro dipirsiya, min dîgo "gelo kî doqtor xapand, an ji rê bir, lê şihitand?" Dîgo: "Îsa Siwar.". Soro vê jî di bîrnama Kek Naci' da beyan kiriye. Ew beyana Soro ye û çi pirs hene di nava wê da veşartî ne. Ez hîvîdarim tiştên ku ev heval dizane hê ku saxe -emrê wî dirêj bîbinivîse û bi xwe ra nebe gorê (Dr. N. Kut. Hat. 201).

Bûyer di 15-yê Tîrmhê 1971-ê da aşkera bû. Ji 17-ê Tebaxê heya serê Îlonê ez û Soro (Nazmî Balkaş) man li ba hev. Di vê navberê da tê bîra min, du caran Îsa Siwar hate Hacûmranê..

Min di heqê Doqtor da bîranînên Cudî, Necmeddîn Büyükkaya, Mehmûd Osman Xwendin. Di kitêba Rafet Ballî; *Kürt DOSYAS** da min Şerefeddîn Elçî xwend.

Dr. Şivan Parti Didamezirîne

Tiştêk xerîb û balkêş ku serê lodê digrê, lêkolînekê Mehmûd Lewendî ye, ku di KOVARA ÇIRA, Hejmar 8, Zivistan 1996 da derketiye. A balkêş ewe ku Dr. Şivan Sala 1968-an paseport girtiye, di vê salê da carek çûye Yunanîstanê, carek jî çûye Beyrudê. Dîsa di wê salê da (1968) çûye Kurdîstana Başûr. 29.06.1969-an da li Enqerê, li "Gazi Mahallesi" di malek da bi 14 kes hevalên xwe va "Partiya Demokrat a Kurdîstan Li Turkiyê" damezirandî ye. Yanê

* Rafat Ballı, Kürt Dosyası, S. 599-613.

beriya ku bi arîkariya PDKT derbazî Başûr bibî, carek çûye Başûr û beriya ku here Başûr kadro bighîne, bo PDKT xurt bike, Partiya

xwe ya ku navê wê PDK-T ye, damezirandiye, an wekî ku Mehmûd Lewendî dibê "ava kiriye".

Hevalek, ku bi Doqtor ra çûbû û nekarîbû pêra bimîne, jê qetiyabû; ew jî weka Dr. Şiyar û RONÎ xwe bi selamet jê dûr kiribû; Reşo Zîlan e. Ev hevalê hêjayî pesnê û zimanzanê bi nav û nîşan, gelek alîcenab e. Li Îsweçê, li Upselayê dimîne. Sala 1993-yan ez û ew û bi birek heval û dostan va li mala Lûtfî Baksî, li Stolkhomê bihev xweşbûn. Şevborka me bi guhdarîkirina Televizyonekê Tirkîyê û "Basın Toplantısı" ya İsmet Sezgin ku li ser agirbesta PKK'ê bû, heya derengê şevê ajot. Piştî ku civîna İsmet Sezgin qediya; Reşo Zîlan 2 seeta behsa Dr. Şivan û çûna wan a Başûr ji min ra kir. Reşo Zîlan vê meseleyê bi taybatî bo min vekir. Go: "Ez dizanim ku tû rûyekê vê pirsgirêkê dizanî, belê ev mesele dû rûyê xwe hene. Min divê vê jî bizanî." Ev xeberdan jî balkêş û girîng bû.

Reşo Zîlan daxil, hemî hevalên doqtor yên ku min ji wan pirs kiriye, dibêjin: "Dr. Şivan di havîna 1968-an da an 1969-an da hat filan bajêrî teklîfa xebatêk tenzîmî ji min ra kir.". Şivan ji wan ra gotiye ku "PDKT-yê, wê referans bide me emê derbazî Başûr bibin, li wê cî bigrin, kadroyên profesyonel perwerde bikin û partiya Seîd Elçî fesih bikin, partiyêk nûh saz bikin û riya micadeleyê di rêxistinek xweser ê Kurdî da bajon." Mehmud Lewendî jî dibê Şivan 29-ê Hezîrana 1969-an Partî ava kiriye.

Têkiliyên Me (PDKT) û Dr. Şivan

Cara yekemîn ku ez pê hisiyam û tê bîra min, Doqtor di 27-ê Îlonê 1968-ê da hat li mahkemekirina me "ku celsa yekemîn bû" beşdar bû. Di celsa didûwan da, (piştî heyvêk) dîsa hat beşdar bû û piştî ku em ji mahkemê zivirîne hepsê, hat hepsê, wî û Seîd Elçî hev dîtî û gazî min û Derwêş û Emer û Şefîq İSSI jî kirin, em muayene kirin, pirs kir ka nexweşiyên me henin an na. Ji vir pê da 3 celseyên mahkemê çêbûn, di van celsan da û di dervê mahkeman da dihat bi Seîd Elçî ra hev dîtî dikira. Hev dîtî bi me tevan ra yek neqlek bû ku min li jor gotibî.

Têkiliyên bi Dr. Şivan ra, Seîd Elçî û xasima Feqî Hûseyn danîbûn, melûmateke hindik didana me, yên berpîrsyarên Koma

Navkom û hew çend. Ew dîtin û lihevhatinên nav herdû Seîdan li hepsê bicî bû. Belê şexsen, min, piştî ku em serê Adara 1969-an texliye bûn, piştî vê texliyeyê min daxwaza xebata partî kir, Feqî Hûseyn vê meseleyê ji min ra waha vekir. Feqî go: "Emê Doqtor û birrek hevalên partî bişînin Başûr, me hemî îmkanatan hazir kiriye, em vê pir xef bi rêva dibin, me divê ku bê qeza û bela em wan derbaz bikin. Armanca me ev e ku em kadro û profesyonelan li wê derê bidin perwerdekirin û ev kadro dagerin nava tabanê partiya me, partî û tenzîma partiyê xurt bikin.

Ew çûn, ew şiyandin û lebat heya payîzê ajot. Feqî qe tû melûmat nedida. Wî û rehmetiyê Seîd vê wezîfeyê dabûne xwe û wan bi serê xwe vê pirsê dajot. Di derbazkirinê da, bi gumana min ji Kurdên sînor îstîfade kirin. Li Eruh (dihê), Şirnex û Silopiya bingehê partiya me hebû; wê demê bi rehmetiyê Emer ra minasebetêk danîn. Netîceten Şivan, Soro, Çeko, Reşo, Şiyar, Ronî û belkî yek didoyên dî jî hebin ku ez nizanim wek Brûsk û Welat, 7-8 kes hatin derbazkirin.

Ew sal, sala 1969-an borî, zivistana 1970-ê da sar û bihar hat. Bihara 1970-ê di 11-ê Adarê da aştiyê anî Başûr, Mela Mistefâ otonomiyê stand û Kurdistanek azad derkete holê. Xebat û fedekariyên van hevalên ku 6 heyv berê darbaz bibûn, bû sebebê ku ji wan ra hat misedekirin da ku li wê cî bigrin. Hevalê PDKT-ê tenê Ronî bû. Berê Ronî şandin Fransa, piştî Reşo û Şiyar şandin Ewropa û ji wana Şivan, Brûsk, Welat, Soro û Çeko man.

Feqî û Seîd bi biharê ve û bi netîca şerrawestin û Otonomiya Kurdan va ketne mitala. Belkî di wê navê da bi ber guhê wan ket ku Doqtor ne li ser hisaba wan çûye. Ji me ra vê venakin. Cara ewil Feqî çû Başûr heyva Nîsana 1970-an. Çû û hat û tewrê Doqtor di guhê me da xwend, Doqtor bi partiya me razî nîne, Di nava me da MIT û ajan hene, em deşîfre bûne, divê ku em xwe tesfiye bikin û bikevine binê hikmê Şivan an li mala xwe rûnin.

Piştî vê agadarîyê bi bayê bezê Seîdê rehmetî çû. Wî jî tişteyê nekir. Reşo Zîlan vê hevdiîtinê herdû Seîdan bi xwe dîtiye û şeva Stolkhomê ji min û birek hevalan ra çise kir. Seîd Elçî û Dr. Şivan gelek hev êşandibûn. Şivan wek ku pîrr bi ser Seîd va çûbû. Şivan pîrr sert û heşîn bû ye. Dûr û dirêj bi hev ra mineqeşe kirine. Çend

roj Seîd maye li mintîqa Behdînan û xatir ji wan xwestiye ku biçê Gilale, ji bo pîrozbahîya Mela Mîstefa bîdestxistina Otonomiyê. Têkiliyên xwe ji hev qut nekirine. Di dagerê da hatiye Zaxo û şandîye pey Şivan ku carekê di hev bibînin. Çewan ku Reşo Zîlan digo; hevalên Doqtor dixwazin ku yek dido bi Şivan ra herin, ji bo ku Doqtor merivek hişke. Belê Doqtor tenê diçî, hevdîtîna bi Seîd ra dike û dizivire Meqer. Hevalên Doqtor jê dipirsin, dibên "we çikîr?" Bersîva Şivan kine û ne gotinek delale. Dîsa heval jê dipirsin, dibên hûn heya kîjan niqteyî hatin? dibê ku Seîd Elçî yek tiştêk xwestiye, min wê daxwazê jî red kiriye; ew jî eve: "Seîd xwest ku berpirsariya Polîtîbüroyê hilde destê xwe û dû endamên vê Polîtîbüroyê hevalên wî bin." Şivan vê daxwazê jî red dike. Piştî dagera Seîd Elçî, me hev li Diyarbekir, li mala wî dît. Hûr û kûr li ser vê pîrsê nesekîni. Digo: "Doqtor li me qelibîye. Bi xwe va çû. Kesî di di ser xwe da nabinê. Li wê cî girtiye. Dibê ez û ji xeyrî xwe kes qebûl nake. Em lê digerin ku riya diyaloga xwe nebîrin, heya yekitîyê bi ser bixin." Ev dîtîna me havîna 1970-ê bû. Ez dibêim heyva Tîrmehê an Tebaxê bû.

Erê, çewa ku Reşo Zîlan ji devê Dr. Şivan neqil dike; Seîd Elçî ji Şivan tenê Polîtîbüro û dû hevalên Polîtîbüroyê xwestiye û gotiye "wekî di Partî li ber te, tabanê partî ji te ra." Doktor wê daxwazê red kiriye û Seîd Elçî dilşikestî şandîye.

Serê sala 1971-an li me derket. Bi gumana min heyva Sibatê bû. "Şark Yaymcılık ve Gazetecilik A.Ş." civînêk lidarxist. Seîd Elçî gazî me jî kir; em ew kesên ku di merkeza PDKT-ê berpirsîyar bûn, em giş beşderê vê civînê bûn. Seîd Elçî ew şev me civand. Civîna me ji serê sala 1968a ku em hatin girtin, heya sala 1971-an -yanê piştî 3 salan- pêk hat. Ew civîn jî civîna pîrsa Dr. Şivan bû.

Seîd û Feqî li ser çûyîna xwe ya Başûr û hevdîtînên bi Dr. Şivan ra, dûr û dirêj melûmat dane me. Seîd Elçî wek ku Reşo Zîlan jî ji devê Doktor dibê, tenê Polîtîbüroyê xwestiye. Dr. Şivan wî red kiriye. Belê Seîd Elçî ji me ra nego ku xwe û dû hevalan ji bo polîtîbüroyê tekîf kiriye.

Li gora gotin û qeneeta herdû hevalan, Dr. Şivan bi xwe va çûye, pozê wî bilind bûye. Bûye xweyî meqer û îmkanên şorişa Başûr wî digrê, ihtiyaciya wî bi me tine. Di vê civînê da em her

pênc kesên ku me partî damezrandibûn û Feqî Hûseyin va 6 kes bûn. Teklîfa min li xar û jor ev bû: "Niha em bo çî serê xwe bi Doqtor ra evqas diêşînin. Gelo roja ku me vê partiyê danî, me cesaret ji Doqtor stand? Doqtor û partiya xwe bila xebata xwe bikin. Ez hîvîdarim ku biserbikevin, rojêk zû bighên armanca xwe. Armanca me ew e; ku miletê Kurd rizgar bî. Ha me rizgar kir, ha Şivan. Niha Pêşniyarêkê min ji we ra heye; ku eva serê 3 salan e ez li pey vê û xweyê vê pêşniyarê me. Ez dibêm em xebata partiya xwe bimeşînin. Em hemî giraniya xwe bidine tenzîma partiyê. Partiya xwe xurt bikin. Ku me partî xwurt kir û em biserketin, wê Şivan jî me qebûl bike û dinya jî me qebûl bike. Ku em partiya xwe xwurt nekin, ne rola me û ne jî siyanet û rûmeta me dimînê."

Hevalekê me -Ku ez navê, navê wî bidim- piştgirîya min kir. Go: "Şakir rast dibê. Bi rastî ez neketime nav xebat û tenzîma partiyê. Îsal 4 sal e ku ez ji we dûr ketim. Niha jî ne wek endam û berpirsyarekê partî, lê wek dostekê teklîfa min ev e; "ku hûn xebata xwe bikin û bi Dr. Şivan ra nekevin berberiyê. Lewra, jî gotinên we kifşe ku Şorişa Başûr piştgirîya wan dike. Wexta ku Başûr piştgirî li Şivan bike û em pêra bikevin rekabetê wê em perîşan bibin. Ez Dr. Seîd Kirmizitoprak qenc nasdikim. Ew, hevalê min e. Min tû însanî wekî wî, muhterîs nedîtiye. Hele ku firsatekê waha bi destê xwe xistibî, dinya tev bibî yek ew nayê rahê."

Teklîfa min qebûl bû. Derwêşê Sedo go: "Tiştêk heye." Hevalan go: "bêje ka çiyê?" Go: "Merivekê min heye mehkom e. Me divê ku li ser tewsiya partî em wî bişeynin Başûr û nameyêk ji wan ra rêkin, li ser merivêk ku me bihîst ji hecê dageriyaye û ew meriv merivêk xetere ye, em wan îqaz bikin."

Li ser vê jî hinêk teredût çêbûn, bi taybetî Dûrnas, vê teklîfê xweşê xwe nanî, belê li ser îsrara Derwêş û Seîd Elçî ev pêşniyar hat qebûlkin.

Min bo çî vê meseleyê dirêj kir? Lewra tofana me û Dr. Şivan bi vê destpêkir. Piştî 15-20 roj ez li Tetwan im, Feqî ji Diyarbekir hat go: "Ew merivê ku name bir Başûr, nameyê biriye daye Îsa Siwar. Îsa Siwar, name tîşkiriye û gotiye "bila carêk jî Seîd Elçî û Derwêş name û merivê xwe bi van aqaran va neşeynin. Lewra ku em wan(Şivan) nasdikin, em Şivan û partiya wî dipejirînin."

Tam di vê navê da Seîd Elçî bi Feqî ra xeber şiyand, ku vê carê divê min bişînê cem Dr. Şivan. Seîd Elçî nedixwesta ku diyaloga me û Doqtor qut bibî.

Sala 1971-ê, piştî 12 Adarê, bi gumana min Nîsan an serê Gulanê ye. Ez roja ku ji Tetwan derketim, ew roj Ûrfî idare (Sîkî Yönetim) li Diyarbekir û der û dorê wê hat îlankirin. Min li Diyarbekir Seîd Elçîyê rehmetî dît. Min pirsî ka tawsiyeyên wî çine. Seîd Elçî, yê çêkirinê bû. Digo: "Dinya neyarê me ye, em nebin dijminên hev. Neyartî tû kar nade vê dozê. Me Doqtor rêkir; bi referansa me gaha vê niqtê. Niha xwe daye ber siya hêzêk çekdar û bi devê Îsa Siwar tehdîdan bi ser me va dişeynê. Divê em jî fena Sûryeyê nebin dûbendî." Hingî tê bîra min, tewsiyên rehmetî ev bûn: "Em çûn- ez û Feqî- me û Doqtor bi serê hev nexist. Tû jî here temasêk bike, bila riya diyalogê qut nebe, em jihev cûda jî xebatê bikin, bila dostaniyêk di nava me da hebî."

Di beriya çûna xwe da min îrtibatê bi wesita Mela Ebdilkerîm Ceylan danîbû, ka ezê di kîjan rê û bi çi paroleyê derbazim. Min vana dizaniya. Ez çûm Cizîrê. Min silamên Rehmetiyê Seîd ji Dûrnas ra bir. Min mesela çûna xwe jêra vekir. Wî ji min ra dûa kir û go: "Ez Şivan qenc nasdikim, Şivan ne mimkine gavên qenc bi aliyê me va bavê, lê ka here, qe nebe em dijminiya hev nekin."

Ew şev min şiyande malêk li Silopî, serê sibê min ji wê malê li çîpêk siwar kirin, birin nêzîkê sînor, li vêdê hevalek dî hebû. Wî xwe da naskirin û go: "Kekê Şakir tû bi xêr hatî, ez Çeko me." Min navê Çeko bihîstibû lê ew gav min wî naskir.

Ez bi Çeko ra derbaz bûm. Li Xaxo em çûn Partî, Licna Mihellî ya Xaxo em bi Osman Qazî ra mişeref bûn û derbazî meqerê wan bûn. Em çûne meqer ku Şivan hê ji Tirkîyê danegeriyaye û ciwabê rê kiriye ku ez jî bi Çeko ra bizivirime Tirkîyê. Em di ser riya Hekkarî da dagerîn hatin Tirkîyê. Ji min ra gotin: wê Doqtor li te bigerê. Bi rastî çend ro şûnda Doqtor hate Tetwan. Ez û Feqî û Doqtor şevêk heya serê sibê ketne mînaqesê, me tiştêk bi serê hev nexist. Di netîcê da tewsiyeyêk Doqtor hebû; digo: "bila Seîd Elçî bê Başûr li Meqerê rûnê û ji me ra mezinayî bike. Ew kekê me ye, emê bikevine binê emrê wî; lê ne mimkine ku em partiya xwe bifeşîlînin û bikevin partiya we. Lewra Partiya we wextê xuliqîye,

yanê ji diya xwe bûye, mirî xuliqîye. Ev partî hê di zikê diya xwe da mirîye. Ne mimkine ku em vê partiyê ji nû va vejînin. Di dervê vê da hûn hatin girtin, hûn deşîfre bûn, xebata bi we ra tehlîke ye. MIT we gişî nasdike. Îddiaya Mela Hemdî -Mela Hemdî di herême da berpirsîyarê îstihbarata Mela Mistefa yê taybatî bû- ew e, ku tiliya MIT-ê di nava we da heye."

Dr. Şivan me mirand, me xista MIT û deşîfre bûyina me bû qisûrekê mezin. Ev îddia tam pûç bûn, min ew şev jî van îddiayan pûçkir, lê gava çavê gur li xwarina berxikê bî, çî ji destê berxikê tê. Partî ne ku mirî zabû. Wextê ev Partî za, li ber serê wê partiyê, bijjîkên ji Doqtor mitehesistîr hebûn. Ev partî eserê Fehmî Bilal, Faîq Bûcak, Kemal Badillî, Seîd Elçî, Emer Turhan û ew ên ku em niha hê saxin. Belê malesew em hê di hepsa Antalyayê da, Dr. Şivan vê partiyê fetisand, me jî jiber ku xebata partî 3 salan rawestand, me dest ji tenzîma partî kişand û tabanê xwe teslîmê Şivan kir. Dr. Şivan bila pîrsa "JÎR"* ji Mela Hemdî bikira. Jîr, yê nêzîkê nêzîk bû li ba Şivan.

Tewsiya û gotina paşî ya Şivan ew bû ku: "Çî azayên Qomîta me ya Merkezî henin, ev aza azayên Qomîta Merkezî ya Partiya wî nin. Seîd Elçî jî hem kekê me û hem jî mezinê me ye. Lewra ku ji me ra lazim e. Bila Seîd bê li Meqerê rûnê, em tev di emrê wî da ne. An bila biçî li Ewropa me temsîl bike, an bila li mala xwe rûnê."

Dora şevê êvarê Feqî hate mala min. Me qerar stand ku Feqî biçî Diyarbekir bi Seîd ra û bi Derwêş ra hevdîtîn bike; ezê jî herim Emer û Dûrnas bibînim, ka emê çewa bikin.

Seîd Elçî Winda Dibe

Dû-sê roj hê derbaz nebûbû; Feqî gote min Seîd Elçî ciwab ji Nisêbînê şandiye gotiye: "bihemhal bila bê ku em derbazî Îraqê bibin." Min jî jê ra gotiyê: "Ew meriv hate vir, me dîtî kir, bihemhal derbaz nebe, divê em hev bibînin." Me qerar da ku emê dora rojê biçin hevlan bibînin. Serê sibê meşhûr "Balyoz Herakati" girtina ku bi navê "Hereketa Balyoz tê zanîn avête ser me. Feqî hate girtin, ez revîm çûm Edenê.

* *JÎR*: Bernavkê Kemal Kaçmaz e. Katibê Şivan ê meqerê bû.

Li Edenê ez û Derwêş rastî hev hatin. Em qederêk li Edenê man. Em li wê hînbûn ku Seîd Elçî derbazî Suriyê bûye. Pîreka Seîd Saîme Xanim û zarokên xwe hatibûn Edenê, mêhvanê Bahaddîn Seydaoxlu bûn. Pîreka wî ji me ra go: Elçî derbazî Sûriyê bûye. Derwêş tekîf kir, bo em jî biçin derbazî Suriyê bibin. Birastî min neva ku Derwêş bitenê bimînê û madem Seîd jî li wêdê ye, belku em muşkula navbera xwe û Dr. Şivan jî hebikin. Li ser vê niyetê em derbazê Sûriyê bûn. Derwêş rojêk beriya min derbaz bûbû.

Ew kesên min derbazkirin, raste rast min birine gundekê nêzîkê sînor ku navê gund Mezrê bû Cîgerxwîn, Hemîdê Hacî Derwêş û Reşîd Hemo li wî gundî hetibûn pêşiya me. Çewa ez çûm hindur, Derwêş mesela wind- abûyina Seîd Elçî ji min ra go. Li ser vê, me şande peyî Dûrnas. Ew şev hate cem me. Derdekê mezin ji me ra çêbû. Me qerar da ku Mela Unisê Tetwanî- Ku bi min ra hatibû. - here Zaxo, Mela Unis çû Zaxo û di nava 3-4 roja da dageriya. Em li Qamişlo man li bende Mela Unis. Mela Unis gava çûbû Zaxo, hatibû girtin, dîgo: Osman Qazî, gazî kir, min parole jêra go, li ser vê Osman Qazî min berda, ez çûm min Mela Mihemedê Paloyî dît. Mela Mihemed, Seîd li Lecna Mihellî ya Zaxo ziyaret kiriye. Seîd 3 roj li vira mêhvan maye. Paşê li pîkabek siwar kirine û ew pîkab bi aliyê Batifan û Meqerê Şivan va çûye, piştî 3 seetan pîkab dageriaye. Melûmat ev çend e. Di vê navê ra Ehmedê HISO ji Gilale zivirî hat, me hev li Qamişlo dît. Ehmed, ji Dîyarbekirê ji Bismîlê ye. Seîdê rahmetî wî jî bi xwe ra biriye. Ji ber ku Paseportê Ehmed hebû, Ehmed di deriyê Mosilê de derbaz bûbû. rehmetiyê Seîd û Mihemedê Begê bê paseport bûn, mecbûrê riya Zaxo bûbûn. Bi gumana min, dîtina me û Ehmed li dora 18-ê Hezîranê bû. Çire ku ez qenc dizanim, ez û Derwêş di 20-ê Hezîranê da derbazî Başûr bûn. Seîd Elçî 23-yê gulanê diçe Zaxo û 25-ê gulanê Çeko, Brusk wî ji Zaxo dibin. Ehmed û Seîd qewlê xwe dikin ku li Mosilê bighên hev. Ehmed, 15 roj dimînê hêviya Seîd. Di van rojan da pir lê digêrê.

Reîsê Îstihbarata PDKI ê wê demê Şekîb Eqrawî ye. Bi alîkiri- na Şekîb, Ehmed xwe davê Gilale. Li Gilale jî serê wî dikevê gêjiyê. Dîsa Şekîb wî xilas dike. Ehmedê Hiso ji Şekîb jî rica dike ka salixê Seîd bidin, belê malesef reîsê Îstihbaratê jî nekariye hîra

bibî. Tiştêk balkêş jî ew e; ku Ehmed û Ziya Şerefxan li Navpirdan (ciyê mekteba siyasî) hev dîtin e. Hewadisêkê ku Ehmed wê demê digo, min divê neqil bikim. Ew ji Şekib hîn bibû. Wî go: "Ez jê hîn bûm e." Ehmed nêzikê 10 rojan bûbû mêhvanê Şekib.

Ev nîr û dema em niha diştexilin, dema Êrfî Îdare û Cunta 12-ê Adarê 1971-a ye. Di heyva Hezîranê da midetê Êrfî Îdarê dirêj kirin. Îsmail ARAR sebebê dirêjkirinê gelek werimend û waha go: "Çar milyon Kurd çekdar bûne wê bi nêzikayî dest bi şorişê bikin." Ev beyanat li dinyayê şoqekê mezin çêkir. Radyo û Telewizyon û rojnaman vê nûçeyê xiste serencema nûçan. Tam di van rojan da, li dora 20-ê Hezîranê heyetekê leşkerî diçî Serok Barzanî îqaz dike û dibê: "Hinêk ji Tirkîyê hatine li nava axa te ya otonom, bûne xweyî cî û meqer û karê xwe dikin ku bi çekdarî berê xwe bidin me." Ji Serok daxwaz dikin ku ev tiştên waha divê neyê kirin û ev hareket bê tesfîyekirin.

Serokê Rehmetî ji wan ra dibê: "Min rê nedaye tû kesî ku bên li vir bibin xwedan cî û meqer û jibo şerê we bikin, perwerde bibin. Tiştêkê waha tine. Hebe jî ez nahêlim ku şaşî bibin. Tû teredut nekin. Belê hûn jî bes zilm û heqsizî bikin. Li Kurdan werin rehme. We gelek Kurd dîsa girtiye avêtiye hepsê." Serok van dibê û heyet paşkî dizivirê. Li gora dîtina min a wê gavê, piştî ku ew heyet dagerî Tirkîyê, birêk Kurd ji bin çav hatin berdan, weka gruba Tetwan.

Piştî ku Mela Unis hat û Ehmedê Hiso van hewadîsan anî, me yeqîn kir ku Seîd girtî ye. Diva ku em li pey herin. Bi rastî min şibhe ji Îsa Siwar dikira, belê min nedigo kesî; belê şibha Derwêş li ser Şivan bû. Em çûn cem Qiyada Muweqet ku serokê wê Dehamê Mîro bû. Deham nayê bîra min, lê Kenanê Egîd min û Derwêş û Mela Unis li cîpa xwe siwarkir anî Tilefrînê. Ji Tilefrînê pêda em bi wesîtên amî çûn Mosilê; li Mosilê riya me û Derwêş jî hev qetiya. Derwêş çû Gilale, ez jî ku herim Meqerê Şivan. Gava me xatir ji hev xwest; Derwêş gote min: "Neçe, bi xwedê tû herî wê Şivan te jî bikujê." Min gote Derwêş "Kuro bi xwedê min wisa dizaniya ku tû bi aqilî." Derwêş vê ciwabê da min: "Tê niha kifş bibî ka ez bê eqilim an tû."

Piştî ku ez ji Derwêş veqetiyam, ez û Mela Unis hatin Zaxo. Em

çûne cem Mela Mihemedê Paloyî. Bi rastî niyeta min wisa pak û paqij bû, min digo gava ku ez Doqtor bibînim, wê Doqtor bi lez û bez bikevê peyî Seîd û emê bi hev ra rûnin yekîtî û birayetiye di neqeba xwe da sazkin. Ji ber wê min diva ku seetêk zû ez bighêmin Şivan.

Min ji Mela Mihemed pirsî; ka ezê çewa xwe bighênim Doqtor? Mela Mihemed go: "bi zanîna min Doqtor li Gilale ye." "Başê ezê çewa bikaribim herim Gilale?" Go: "Tû nikarî herî Gilale. Encax Osman Qazî destûrname bide te, tê bi vê destûrnameyê karibî biçî." Min Mela Unis hişt û bi lez ez çûm Lecna Mihellî ya Zaxo. Osman Qazî ne li Lecnê bû. Mala wî şanî min dan, ez çûm mala wî, li derî da, ji min ra gotin "nivistiye..." Min go: "pir girîng e" çûn wî şiyarkirin, ez derketim cem Osman. Min jê rica kir ku bi çî kul û halî dibî bila bî, bila min û Dr. Şivan zû bighîne hev û min çiroka windabûyina Seîd Elçî jêra qîsa kir. Wî gote min "Te xelet bihistiye, Seîd nehatiye lecnê, bihata min ê bibihîsta, ez Seîd nasdikim. Tiştêkê waha ne mimkine." Min go: niha hun ji kerema xwe dikarin min bişeynin Gilale. Hûn dibên wê Şivan heya hefteyek bizivirê, heftiyek dirêj e. Ez ditirsim siyaneta Seîd bê şikêandin, an xeletî çêbin wê gavê yekitiya me û Doqtor ne mimkine. Tû jî dizanî ku berî çendekî ez bi Çeko ra hatim, min we zîyaret kir. Ez hevalê Seîd im. Jibo yekitiyê, me û Doqtor hevdiyê û em nêzikî qonaxek qenc bûne. Ez dîsa hêvî dikim ku hûn min bi zûyî va bighînin Şivan. Osman Qazî pîrsa Seîd kir, go; "li Tirkîyê Seîd pir tê hezkirin." Min go: "li Tirkîyê dar û devî jî ji Seîd Elçî hezdikin." Osman li ser vê waha gote min; "Bi serê Kurdistanê haya min jê tine. Em niha edemêtehrir (destûrname) nikarin bidin. Rê xweş nînin û nava me û Bahsiya ne qence. Ezê te bişeynim meqerê Şivan, heya sê-çar rojan wê Şivan bê."

Ez rast hatim cem Mela Mihemed. Min go, ez çewan dikarim xwe bigihînime Dewrêşê Sado. Mela Mihemed jî kîsê min quryeyek peydakir û min nameyek ji Derwêş ra rêkir. Min go: "Vaye ez diçim meqerê Şivan. Osman Qazî bi serê Kurdistanê sond dixwe ku Seîd Elçî nedîtiye. Hay ji xwe hebe û di dijê Doqtor da tiştêk nebêje."

Ez û Mela Unis li pîqabek siwar bûn, me berê xwe da Meqerê

meşhûr ê Dûşêşê. Mela Unis pir kêfxweş bû, ketibû erdekê azad, ji firariya xwe ya bisalan xilas bûbû. Em çûn Meqer ku Mela Ebdilkerîm û hevalên din li wê ne. Min ji Seyda pîrskir, lê Seyda ciwaba min rast neda. Go: "Welleh min hay ji Seîd Elçî nîne. Dibe ku dageriya be Tirkiyê."

Rojek-dîdo şûnde Şivan hat. Şivan min tenha kir û pîrsî ka hûn li çi digerin. Hûn li Sûriyê bi Cîgerxwin ra civînan çêdikin, gavekê we li Gilale ye, yek li Zaxo ye. Min go: Birayê min bihêle ez pîrs bikim. Me li Sûriyê di derheqê windabûyina Seîd Elçî melûmat hilda. Me tesbîtkir ku sê roj li Lecna Mihellî ya Zaxo maye û wî li pîkabek siwar kirine, pîkab bi alî meqera te va hatiye û sê seet şunda ziviriye. Niha ev tiştê ku ez ji te ra dibêm ne ez û Derwêşê Sedo tenê dizanin, hemî rêxistin û siyasetzana yên Sûriyê dizanin. Doqtor pir hêrs bû. Go: "Başê hûn li pey çiyê Seîd digerin, ew meriv nîvmeriv e. nexweş e, kêr xilasiya Kurdistanê nayê, ev dawa bi nexweşa naçe serî; ez nizanim we çi li ba vî merivê nîvmeriv dîtiye, ku we hemî umida xwe pêva girê daye." Ez kenîm. Min go: "Doqtor! Ma tû bo çi hêrs dibî? Em rêxistinekê siyasî ne, Seîd Elçî sekreterê partiya me ye, sekreterê me wînda ye û em lê digerin, gelo eybek di vê derê da heye ku tû hêrs dibî. Binêr Doqtor, em û te li Tetwan gahane delavekê lihevhatinê, belê wextê siyaneta Seîd bi qasî zereyêk bişkê, em li qiyametê jî nabin yek." Doqtor nerm bû. Mêkmêkê wî sekinîn. Bû merivê helîm û selîm. Go: "Başê, tû heqliyî, niha ez bi serê xwe, bê qerara hevalên xwe nikarim bikevime peyî vê pîrsê. 10-15 roj şûnde wê hevalên min ên Qomîte Merkezî bînin bicivin. Ez dizanim ku niha hûn nikarin dagerine welat. Tû ji xwendinê pir hez dikî. Birêk kitêbên Kurmancî li vir hene. Hemî faskulên Hewar'a Celaded jî hene, heya te divê bixwîne û îstahat bike. Heya hevalên tîn, emê qirar bistînin û li Seîd bigerin."

Ez 20 roj mam li meqer. Di vê navê da hevalên Şivan yên merkezî û herêmî çi hene hatin. Semîneran çêkirin, konferansan dan, xebat kirin û herkes belav bû cî û warên xwe. Ez dengê xwe nakim, hêviya Dr. Şivan im, ka kengê dora min tê. Şevêk, pêşmergeyekê ku nobetê digirta, xelkê Sûriye bû, hat min ji xew rakir go: Dr. Şivan gazî te dike. Ez û Mela Unis li cem hev di

odeyek da radiketin. Ez rabûm çûm ku Şivan û bi heyeta xwe va rûniştine. Çeko, Soro, Zendo, Kurdo û Şivan rûniştibûn. Doqtor gote min: "Min bi hevalan va qarar girt ku em teklîfa xebata partî li te bikin. Heval dibên ku di herêmên Bedlîs û Sêrtê da rolekê te yê xwurt heye. Ka tû çi dibêjî?" Ez gelek şaş mam. Hinek sekinîm, ponijîm û min berê xwe da Doqtor go: "Doqtor, tû qenc dizanî ku ez ne dîplomat û xwedan qaryerek bilindim, ez ne dewlemendekê bê henpa me, ez ne şêx im ne jî axa me; niha çewa ku we go, ku bi rastî di hinêk herêmên Kurdistanê da rola min hebî; ev rol dewle li serê fidekariya min e ku min tû car menfîetê xwe yê şexsî li ser milê kesî ne parastîye û pêl siyaneta kesî nekiriye, kesî nekiriye pêlpêlok. Ez, bû bîst roj li vir hêviyê me ku ev hevalên te bên, tû wan bibînî û gazî min bikî, pîrsa Seîd Elçî çareser bikî. Seîd Elçî sekreterê partiya min e. Winda ye. Ez li peyî hatim e. Niha ezê wî bihêlim û bêm bikevime nav xebata Partiya te... Binêr Doqtor , tû ji vê Duşêşê heya Gilale tiştê dizanî. Weka ku te ji min ra go "Derwêşê Sado bi Mela Mistefa ra 4 deqîqe hevdiîn kir" "Pekî bo çi tû ji vir û Gilale dikarî deqîqeyên Derwêş bihejmêrî û çewa Seîd Elçî tê Zaxo, hevalên te Çeko û Brûsk tén wî ji vir hiltînin tînin bi aliyê Meqerê te va û tû nizanî ka çi hatiye serê Seîd Elçî? Niha ezê gotina paşî bêjim; eger Seîd Elçî di binê erdê da bî jî tû dizanî.." Min berê xwe da Mela Ebdilkerîm "Pekî Zendo: Eshed Xoşewî li ber min ji te pîrs nekir, ka Seîd Elçî li ku ye, û ne gote te ku Çeko û Brûsk wî ji Lecnê hilanîne birine?" Zendo go "Belê, willeh, Eshed vê yekê go." Min go "Pekî Seyda, va ye Çeko li cem te rûniştîye, qe nekete bîra te ku tû pîrsa Seîd bikî? Qey Seîd pisîkek bû, winda bûbû? Ev Soroyê ku niha saxe; wexta ku Ebdilkerîm Ceylan gotinên Eshed Xoşewî dúbare kir, xeberê Ebdilkerîm da birîn û waha go bi tirkî "Eger Eshed bu laflarî sۆylemiş ise, buraya bir nokta koymak lazım."

Ew hevalên Qomîta Merkezî bêhis bûne, guhdarî dikin. Doqtor berê xwe da Çeko û Go: "Tamam, madem ku tû ev çend îsrar dikî, emê te bibin cem Seîd. Bila heval ji Mosilê dagerin emê we bi hev rûbar bikin. "Wexta ku Doqtor van tiştan dibê û li Çeko mêze dike, berê min jî zivirî Çeko, min dî ku Çeko gotina Şivan dipeşirîne, tesdîq dike. Ez pir bextewar bûm, ji kêfa ezê bifiriyam. Min pîrsî ka

ev heval kengê diçin Mosilê û çî wext wê dagerin. Çeko û Elîşêr wê biçûna û roja dûyemîn wê bizivriyana. Min seeta xwe da Çeko ku li Mosilê temîr bike û min xatir xewest çûm oda razanê. Ew şev têr razam.

Sibê piştî nîvro ku siya Çiyayê Dûşêşê da ser Meqer; Şivan û hevalan weleybol leyztin. Hebû 2-3 seet leyztika wan dewamkir. Ez jî yek ji temaşevanan bûm. Leyztik qediya; Doqtor hat cem min, go: "Te divê em qasek bigerin?" Ez û wî derketine berwarekê bi dar û devî û bi çiya va bilind bûn. Bi qasê seetek em geriyan, zivirîn. Di vê seetê da Doqtor hindêk tişt ji min ra got ez hêja jî merheze dikim, gelo bo çî herwekî wesiyeta xwe dikira, min di hinek delevan da hişyar dikira, an serê min tevlihev dikira; behsa partiya xwe, felsefa partî, yekîtiya me, sebebê em nebûn yek kêmasiya Seîd, qerekerê berpirsyar û serekhêzên şorişa Başûr. Mela Mistefa, Îdris, Mesûd, Eshed, Selîm. Îsa û birek însanên gerandekar û rêvebir anîn ziman. Di dijê wan da nebû. Pir bi pesin qala wan û Şorişê dikira. Pir ji Serok, Mesûd û Eshed razî bû. Mesela yekîtiya me vebû. Min tiştêk go: "Divê hemî Kurd lê bigerin, xwe bigihînin armancê, bighên netîceyêk, ya girîng ewe ku Kurd xilas bibin, rêxistin wesîte ne bo armancê." Xeberdanê min di vê dozê da, wî xeberê min birî û go: "Aha.. îşte Sait bunu anlayamadı." (Ha.. Seîd vê yekê fêhm nekir.) Ez veceniqîm. Min bê hemdê xwe qîr kir "Çewa? Qey Seîd ne li heyatê ye?" Wî xeberdana xwe zivirand û go: "Yanlış hat fahmkirin. Seîd sax e. Bila heval bên emê dîtina we temîn bikin.

Doqtor ji dûr va çiyayêk bi dar û berên gumre û keresî nîşani min kir. Ev çiya diketa piştî Qumriyê. Behsa avên sar û şênbûna wê derê kir û go emê rojêk herin wê derê pezek şerjêkin û roja xwe li wê derbazkin. Divê navê da yekî ji dûr va gazî Doqtor kir, Doqtor bilez da rê, ez jî ketim pey em berjêrbûn hatin Meqer. Li Meqer Pêşmergeyek li hêviya wî bû. Pêşmerge nameya Eshed Xoşewî dirêjî wî kir. Name xwend û berê xwe da hevalên xwe -Xasima Zendo- go: "Neviyê Kek Eshed nexweş e. Divê biçim. Aletên xwe yên tîbbî hilda û li hêstirê siwar bû, xatir xwest û bi rê ket. Navbera Duşêşê û Bamernê bi hêstirê, bi hêz, lez û bez kêmî 3 seetan nebû. Ew heya gihane Bamernê, şevê da ser wan.

Kûştina Seîd Elçî Tête Îlankirin.

Dora rojê li rojgermê, çaxê dana çend pêşmerge hatin, nameyek dirêjî Zendo (Ebdllkerim Ceylan) kirin. Zendo name xwend, reng avêt, name ji Dr. Şivan hatibû. Doqtor di nameyê da gotibû ku, ciyê me hatiye tesbîtkirin, divê kes li wir nemînê, tû tiştî ji ciyê wî hilnedin û bê çek hûn çî henin werine Bamernê. Em tev ketin rê. Yek-dido kulek hebûn wek Zendo û Dijwar, diva ku siwarî bân. Pîreka Brûsk û Brûsk jî piştî me hatin. Tû fikrekê xerab ji kesî, ji me ra çênebibû. Em wek herin dîlanê, hevrazê çiyayê Metîna bûn û bi serê çiya ketin; ji serê çiya berjêrê Bamernê bûn. Ev hevraz û berjêr bi seetan dikşînin.

Pêşmergeyên ku bi me ra bûn, me birine avayiyek, xaniyekê bi hey- bet bû. Mala şêx Ebdillayê Bamernî bû. Ev mal kiribûn malê şorişê. Wê gavê xweşê me ji dihata ku mala Şêx bûye malê mîrî. Em bi kêf û laqirdî ew şev li wê derê man. Sibê di tavgermê da, Mela Hemdî û çend hevalên Doqtor ku li qerargaha Eshed diman bi hevra hatin, me deranîne banikê ber derê tekuyê û Mela Hemdî bi dengê bilind û heyecan dest bi xebera dijwar kir û malwêraniya Doqtor vekir. Operasyon bi ser ketibûn. Gunehkar tesbît kiribûn. Şahidê bûyerê şahdeyîya xwe dabûn, micrima cirmê xwe îtiraf û qebûl kiribûn, gor hatibûn vedan û meqtûl hatibûn tesbîtkirin. Tû şik û şibhe di vê malkambaxiyê da nema bû.

Ne hewceye ku meriv bêje ka ev menzere çî qeder qirêje, pîs û cepel û dijwar e.

Piştî ku Mela Hemdî gotara xwe qedand çû. Pêşmergeyek hate pey min. Eshed Xoşewî gazî min kiribû. Ez çûm ku Kek Eshed û Mela Hemdî bi tenê rûniştîne li benda min in. Eshed go: "Hûn hevalê Seîd Elçî ne, waye Doqtor dibê Seîd casûsê Tirkan e, ka dîtina te çiyê?" Min go: "Ez fêhm dikim ka Doqtor bo çî Seîd Elçî kûşt, dixwesta ku reqîbê wî tinebin, lê ez ecêbmayî dimînim ku mêr mêra dikuujin û bi kûştinê jî qayîl nabin; bêbextiyê davên sitwê hev."

Min mesela Şivan û Seîd û derbazkirina wan û çîroka Şivan ji Eshed Xoşewî û Mela Hemdî ra vekir. Tesbîta min ew bû ku: "Doqtor merivek muhterîs bû, kesî di ser xwe da qebûl nedikir û bi kûştina Seîd Elçî bi serê xwe dima û dibûya pêşkêşek bê reqîb. Ku

reqîbê meriv xayîn û casûs bî, ma hewceye ku mirov cirmekê waha bike, ji xwe milletê Kurd wê Seîd Elçî ceza bikira. Reqabeta navbera partiyan, bi xiyanet û casûsiyê divê neyê tabîrkirin. Vaye ez hevalê Seîd Elçî me û dibêmin Doqtor ku vê yekê kiribî micrim e, qatîl e, lê ne casûs e, ne xayînê welat û milletê Kurd e." Eshed bi xeberdanên min pir kêfxweş bû. Bi min şah bû. Ji min daxwazkir ku ez raporek li ser têkiliyên navbera Partiya me û ya Şivan da derbazbûyî binivisînim. Go: "Ji kerema xwe tû bêje, bila katibên min binivisînin." Min hinêk kaxis jî sitand û êvarê li qonaxê ku em lê diman, min nivîsand da Kek Eshed.

Hevdîtina Min û Dr. Şivan

Kurê Eshed Xoşewî, Selîm Xoşewî hate ber guhê min go: "Doqtor dîtina te dixwaze. Ku te bivê, ezê te bibim cem." Ez qasek ponijîme û min qebûl kir. Divê meriv di bûyerên dijwar da bênfirêh bî. Tirk dibêin "soğukanlı." Ez û Selîm çûn wê mala ku Doqtor û hevalên xwe li wê girtîbûn. Odeya ku lêbûn, odeyekê biçûk bû. Raxistî bû. Doqtor û hevalên xwe yê qomîta merkezî û hinek hevalên din jî li wê bûn. Selîm Xoşewî selam kir, kete hindir, ew tev ji berva rabûn, Selîm derbazbû li ser sendoqêk rûnişt, ez jî li teniştê li ser dikê rûniştim. Şivan bi Tirkî- jibo Selîm nizanbî em çî dibêin- waha dest bi xeberdanê kir: "Ez dizanim ku tû niha min pîrr dijwar rexne dikî." Min go: "Doqtor, ez qaraqar û qîreqîr û qirênê nakim, ezê kurt û niha ku ez di vî derî da ketim hindir û çî hatibî bîra min ezê wê bêjim û bes. Niha ku ez ketim hindirê vê odeyê, min ji xwe ra go xwezî ew roja ku Seîd Elçî û hevalên wî hatin kuştin, ez jî bi wan ra bûma, bihatima kuştin û niha di binê axa sar da bûma, lê min we di vî halî da nedîta. Lewra Doqtor! Tû dizanî ku te çikîr? Te tenê Seîd Elçî nekûşt, te xwe bi xwe jî kûşt û ji holê hilanî. Te tenê bi kûştina Seîd Elçî; xwe û Seîd Elçî ji holê hilnanî, te dû hereketên siyasî fetisandin. Te partiya xwe jî fetisand û te ya me jî fetisand. Niha ezê çewa bikim û çî bêjim ku berge bigrê." Bi rastî jî min ji vê pêva ji Şivan ra tû tiştê nego û min carek dî mînaqêşe nekir. Şivan go: "Ez divêmin ji te ra hinêk tiştan bêjim. Ez nabêjim ku tiştê min kiriye rast e. Ez li pey îddiyekê waha nînim.

Ez jî niha vê kirinê xelet dibînim. Ez vê mineqeseyê nakim. Seîd Elçî, Ehmedê Hiso û Mihemedê Begê roja ku hatine ber deriyê Mosilê ku derbazê Iraqê bibin, di wê rojê û wê seetê da Ziya şerefxan ji Beyrutê bi teyarê hat li Bexdayê peya bû. Li gora îstihbarat û tesbîta ku min kire, Ehmedê Hiso çû Beyrûdê, Ziya dît, xebera wan bû yek, wê Ziya û Seîd li Gilale bigihîştina hev, Seîd Elçî, Ziya xistibû dewreyê, ku biçin giliya me ji Mela Mistefa ra bikin û me ji vira rakin, hereketê me bafesîlînin.

Seîd Elçî û Mihemedê Begê, ji ber ku Paseportê wan tine bû, mecbûrê riya Zaxo bûn. Şerefxan di roja randewiya xwe de hat Bexdayê û derbazî Gilale bû. Seîd li Zaxo bû, mêhvanê Lecna Miheliya PDK-ê bû. Di navbera me û teşkilata zaxo da protokolek heye, li gor vê protokolê, ew meriyên ku li Tirkîyê derbazî vî alî bibin, heya xeber nedine me nikarin wana bişeynîne ciyek. Mektûbêk ji min ra hat ku Seîd Elçî li Zaxo ye, ez û hevalên xwe civiyane, me qerar da ku em wî binin li Meqer mêhvan bikin û nehêlin biçî Gilale. Ez û Çeko û Brûsk bihevra çûn Zaxo. Ez neçûm lecnê, lê Çeko û Brûsk çûn Seîd dîtî; Paşê me Seîd ji Lecnê hilda û ez jî gihame wan, me dûr û dirêj vê pîrsê minaqese kir. Min pîrê hêvî û zarî kir ku neçe Gilale giliya me neke, min wî nanî rê tû çare nema.

Rast weya xelet, di bawerîya me da, me li vir darek danîbû, wê ev der hêşin bibûwa û fêkî bida. Me digo ku emê Kurdistanê azad bikin. Seîd jî projeyê me serûbin dikira. Em mecbûr man, min û Çeko qerarê kuştina wan da û da înfazkirin. Lewra ez Sekreterê Polîtîbüroyê me û Çeko jî aza ye. Em herdû bi serê xwe dikarin qerarê waha bidin. Ezê tiştek din jî bêjim, ku babê min bi xwe li pey Seîd Elçî bihata, minê babê xwe jî bikûşt, rast an xelet; "Tîr ji kevan derketibû*** Yanê bi Tirkî: .. Artık Ok Yaydan çıkmıştı" (Ew jî ez bûm yê bihata kûştin, şeva ku go emê te bibine cem Seîd û berê xwe da Çeko, Çeko jî tesdîq kir, ew qerarê kuştina min bû).

Doqtor, piştî ku vê senaryoyê dûr û dirêj vekir û raxist, bi min xwest ku hinek gunehê xwe biweşîne, hindêk jî avê li ber me şilo bike. Zivirî hevalê xwe û ji wan ra hinêk tişt go: Wek: "Divê hûn xebera Şakir ku dibê ev partî ji holê rabûn bixne guhê xwe. Divê bi hindikayî hûn 4 salan siyaset nekin. Min dizaniya ku rojek wê me rawestînin, lê ne hevçend zû. Bi min wê yek weka Dihamê Mîro ji

me ra jî peyda bikin". Wextê ku xeber dida bi taybetî berê wî li Soro bû. 2-3 caran tekrar kir û ji Soro dipirsî: "Îsa çi dike?" Cara paşî ku pirsî, Soro go: "Ez çi zanim ka çi dike."

Binçav Kirina Dr. Şivan û Hevalên Wî

Selîm Xoşewî rabû piya, ez jî rabûm û ez ji oda girtiyên ser doşekan derketim. Wê şevê min heft per raporek nivîsî. Xwezî niha ev rapor ji arşîvên PDK-ê derketana. Bi min ez wan rojan îdî siyasetzan bûm. Sibê ez çûm min raporê xwe da Kek Eshedê rahmetî, ji min ra sipas kir û daxwaz kir ku ez bi Doqtor Şivan û hevalên wî ra biçim Gilale. 3 heb landrower hatin. Mela Hemdî û 2 landrowerên teji pêşmerge heya Dihokê me teqîb kirin. Li Dihokê Mela Hemdî ji me qetiya, ez, Şivan, Çeko, Soro û Selîm Xoşewî û mihafizên wî bi yek landrower ketne riya esfaltkirî ya Hemîlton û me berê xwe da Gilale, em birin Hacîûmranê li Otêla Kak Ebdillahê Sorî kirin mêhvan. Ez pir reht û bê xew bûm. Li şeqlawa me xwarin xwaribû. Min bi kinca va xwe avête ser qaryolê û di xew da çûm. Min çavê xwe vekir ku tavê daye. Ez û Soro bi tenê mane. Min pirsî ka Şivan û Çeko? Soro go: "Bi şev hatin gotin li Mekteba Siyasî gazî we dikin û wan birin, di çûnê da Doqtor qaryola te hejand tû şiyar nebûyî." Jê pêva min Doqtor û Çeko nedît. Wan avêtine hepsa "RAYET". Vê hepsê Inglîzan çêkiribû. Li ser devê riya Hemîlton bû. Pir mezin nebû. Di navbera Navpirdan û Hacîûmranê da bû.

15-ê Tîrmehê bûyer li Bamernê pişkifi, di 16-ê da me anîne Bamernê, roja 17-ê Mela Hemdî hat vê bûyerê ji me ra qisekir. 18-ê Temmûzê em çûn Hacîûmranê. Ew şev Dr. Şivan û Çeko xistin hindirê Hepsa Rayet. Di navbera 18-yê Tîrmehê û serê Îlonê 40-50 roj ez û Soro di vê Otêlê da man li cem hev. Dû neqil bi Dr. Mehmûd Osman ra û dû neqil jî bi Berêz Îdrîs Berzanîyê rahmetî ra hevdiîtinên min çêbûn. Herdû neqlên ku Îdrîs min qebûl kir, Soro bi min ra bû. Ez niha jî nizam ka bo çi me bihevra qebûl dikira. Bi Mehmûd Osman ra jî cara pêşî Soro hazir bû. Ez li Hacîûmranê xelet hatim famkirin. Bi rastî hevalên min jî ketne dijê min.

Min diva ku ev mesele baş bê kolandin û tehlîlîkirin, ka gelo Doqtor vê cesaretê ji ku stand û bo çi vê şaşiya mezin kir.

Rehmetiyê Îdrîs nexwest ku bîne heyeta teşkîl bike û ev komisyon meseleyê bikolin, tetqîq bikin û dirêj bikin. Wî digo "mesele kifş-eye, Şivan ji ber quminîstiya xwe, casûsî û bi pera vê yekê kir. Min jî vana red kir." Bi tenê ku rehmetiyê Îdrîs bi ya min û arznameya ku min nivîsî teqdîmê wî kir bikira, niha di heqê wan da wê hin rexneyên neyînî (rexneyên bêesil û estar) çênedibûwana û zimanê gelek însanan kurt bûya.

Ku arşivên şorişa Pîroz winda nebibin, bila ji kerema xwe arzname min derînin û bibînin, ka di sala 1971-an da min rewşa pêvajoya sîyaseta kurdan çawan dîye û min çi gotiye. Ez li ser dû tiştan sekinî me. Ya yekemîn, ji bo rêxistina Kurdên Tirkiyê, ez piştevanîyek xwurt ji wan dixwazim û dibêim heya em nekevîne pêşîra Tirkan, Tirk nahêlin hûn li vir bibin dewlet. Ya dûyemîn, ez dibêim ku ev bûyera Şivan neyê analîzkirin, texlîlkirin û rastiya vê dernekevê holê, wê siba Kurd bêjin "yek bi destê yekî dan kûştin û yê din jî wan kûşt" tabîr tam ev e. Gotin û daxwaza min ya ew roj ev bû. Dibe ku ez wê demê 33 salî bûm, xwîna min germ bû. Ez niha dibêim ku PDKT xwurt bibûwa; bi riyek pasîf Tirkiyê mecbûrê demokratiyê bikira, ev xwîn nerijîya, peymanî Cezayîr jî nekaribûwa Otonomiya Kurdan ser û bin bikira, ma ne qenctir bû.

Belê ez niha dibînim ku herekat ne besîtin û li tû derê dinê ne bi serê xwe ne. Divê em dijiwariyan nekin, hev gunehkar nekin û rehmê li hevkin. Zilma neyaran besî me ye. Em zilmê li hev nekin. Di dilê min da jî azadî, serfirazî jîyanekê însaniyê jibo kurdan, di serê hemî rêxistin û însiyativ û welatperweran da jî ev heye. Lê me çi ji heve. Em bo çi xwe di hev da dixwirînin?

Yakın Tarihimize

Doktor Şivan ve Said Elçi Olayı*

Sakir EPÖZDEMİR

Bana göre, bu olayın yakın tarihimize ışık tutacak önemli bir yeri vardır. Acı ve çirkin bir örnek olmasına rağmen; şayet doğrular yazılıp belgelenemez ise, bu durum, yalan ya da yanlışlarla çok daha kötü bir manzara teşkil edecektir .

Olayı yorumlamadan, tüm çıplaklığıyla ortaya koymak lazımdır. olayın kahramanları iki ayrı siyasal oluşumun liderleridir ve ikisi de maalesef hayatta değildirler. Bu durumda, olaya yakından tanıklık eden bu siyasal oluşumların en üst düzeylerinde görev alan kişilerin gördüklerini, şahit olduklarını ve gerçeğe yansıyan belgelerini açıklamaları gerekir.

Bu olayda iki taraf vardır. Bunlardan birisi; Said Elçi yani *Türkiye Kurdistan Demokrat Partisi (TKDP)* taraftarları, diğeri de, Dr. Şivan tarafı yani *Türkiye'de Kurdistan Demokrat Partisi (T-KDP)* taraftarlarıdır. Bu iki partinin yazılış şeklindeki tek değişiklik, "**de**" anlamını ifade eden (-) ekidir. Bu iki partinin siyasal programlarında elbette farklılıklar vardır. TKDP Programı; "hukuk nizamından yana olup, sonuna kadar demokratik bir çizgiyi hedef almaktadır" Doktor Şivan'ın T-KDP'sinin Programı ise, daha radikaldir ve ne kadar gizlenmek istense de, bu Program'ın, Marksist bir hedefi vardır.

* Şakir EPÖZDEMİR'in bu yazısı, WAR'ın 5-6. sayılarında Kürtçe olarak yayınlanmıştır. Okurların isteği üzerine aynı yazının Türkçesini de bu sayıda yayınlıyoruz.

Ancak, bu partilerin tabanı, aynı tabandır ve bu tabanda bulunanlar arasında, fikir ayrılıkları "yok denilebilecek" noktadadır. Bundan dolayıdır ki, her iki partinin tabanları arasında, bu olayla ilgili olarak, hemen hemen hiç bir münakaşaya şahit olmadık. Sanki, her iki taraf da olayı aynı düzeyde algıladılar. İslam'da olduğu gibi; "katil"e ve "maktul"a aynı mesafede üzüldüler. Ben buradaki örnelemeye, islam'daki sehabelerin kavgasından yola çıkarak, başvurdum.*

Yoruma girmemek için hemen konuya dönelim. Ben bu olayın gerçekten aydınlanabilmesi için, "altı kişinin tam bilgilerine başvurulması gerektiğine" inanıyorum. Bu altı kişinin; üçü Dr. Şıvan tarafı, diğer üçü de Said Elçi tarafı olmalıdır. Dr. Şıvan tarafından: a) Reşo Zilan, b) Soro, c) Kurdo'nun gördükleri ve yaşadıkları çok önemlidir. Bu üç şahıs da, 1968'den başlayarak 26/11/1971'de noktalanana güne kadar, Dr. Şıvan'ın yanındadırlar ve üst düzey görgü şahitleridirler.

Said Elçi tarafı olarak da; Feqi Hüseyin Sagnıç, Derviş Akgül ve bendeniz Şakir Epözdemir, bu olayın, başından sonuna kadar canlı şahitleriyiz. Nasıl ki, biz üçümüz bu olayın tüm yönlerini aynı boyutta bilemiyor, kendi açılarımıza yansıyan gelişmelerin birer aşamalarını çok daha iyi biliyorsak, yukarıda takma isimleriyle zikrettiğim Dr. Şıvan tarafı arkadaşlar da, Dr. Şıvan olayının birer dönemini ve birer kısmını çok iyi biliyorlardı.

Elbette, söz konusu bu 6 kişinin gözlerinden kaçan olaylar da vardır. Şurada burada bilgilerine başvurulabilecek kişiler de olabilir. Dr. Şıvan'ın IKDP sorumlularıyla veya IKDP'nin askeri kanadındaki kimi yetkilileriyle irtibatını bilmeyebilirler. Tüm bunların yanısıra, IKDP'nin tesbitleri de önemlidir. Belki, hala açıklanmamış şeyler de vardır. Olayların ilk başladığı sıralarda, tesbitler, çok sathi ve basit idi. Bir defa, ya Dr. Şıvan IKDP'nin Zaxo bölgesindeki "İsa Sıwar" düzeyinde yönlendiriliyordu veya Dr. Şıvan, onları kendi etki alanına almış durumda idi.

* Siirtli molla Halil'in "*Nehcillenam*, kitapçığında kürtçe olarak şu şiir yer alıyor". NEHCILLENAM, bir nevi öğüt ve islami kurallar hakkında bilgilerden meydana gelir. Aslen Hizanlı olan ve Siirtli Mela Xelil diye bilinen bu bilge Sahabelerin Savaşları için aynen şunları söylüyor: "Ji herba Sahaban nekin qal û qîl/ Buheştîne hem qatîl û hem qetîl". Anlamı, Sahabelerin kendi aralarındaki Savaşları çekiştirmeyin iki taraf da cennetliklerir."

Benim açımdan, benim Partim'in lideri olan Said Elçi'nin, o günkü telaşından hiç bir şey anlamış değilim. Söylemek icap eder ki, O'nun Suriye'ye giriş ve çıkışı çok hızlı... Bize hiç danışmadan, Ahmedê Hıso ile Mihemedê Begê'yi, yanına alarak, yola çıkıyor. Suriye'deki dostlarımızın, O'na adeta yalvarırcasına "gitme, acele etme, bir müddet burada kal, sana ihtiyacımız var, seninle konuşacaklarımız var" demelerine rağmen, onları dinlemiyor. Rahmetlinin acelesi vardır. Acaba, neden?.. Musul Kapısı'ndan geçemeyince, hangi cesaretle Zaxo'ya gidiyor?.. Bunların hepsi birer soru işareti...

Eğer, yukarıda önerdiğim 6'lar, tarafsız bilgi birikimlerini ortaya koyarlarsa, bu olayın görünen ve görünmeyen boyutlarının, %90'ı ortaya çıkar. %10 kısmını da, her iki liderin kendi siyasi örgütlerine haber vermeksizin, kendi kafalarında şekillenen projeler ve neticeye varmayan kendi teşebbüsleri olarak ilave etmek gerekir .

Olayın üzerinden 27 yıl geçti. Birçok yorum yapıldı ve yazılar yazıldı. Bu yazılardan benim görüşüme göre, iki tanesi önemlidir. Şerafettin Elçi'nin, Rifat Ballı'nın hazırladığı KÜRT DOSYASI'ndaki açıklamaları tamamen doğrudur(Bkz: Rifat Ballı Kürt Dosyası 2.Baskı)." Açıklanan olaylar doğrudur" diyorum. Yorumları, kendisindedir. Zira, henüz bu olay netleşmediği ve bazı şeyler henüz söylenmek istenmediği için, yorumlar da eksik kalmaktadır.

Ayrıca, Mahmud Lewendi'nin ÇIRA DERGİSİ'nin 8. sayısı'nda, Doktor Şıvan ile ilgili olarak, bir belgeler dökümü vardır. Bu belgeleri mutlaka değerlendirmek lazımdır.

Bunların hepsi, benim önerilerimdir. Bana düşen görev, bildiklerimi, gördüklerimi bu kağıda dökmektir. Yoruma Sıra gelince, yorum da yaparım... Ne var ki, işin iç yüzü ortaya çıkmadan yapılan yorumlar, bizi yanıltışa götürebilir.

Ben 1965'te Diyarbakır'ın Gazi Köşkü'nün bahçesinde, kuruluşuna karar verilen TKDP'nin kurucu üyelerinden biriyim. Bu Parti, 5 kişi tarafından, 11 Temmuz 1965'te kuruldu. Bu 5 kişiden ibaret olan Kurucular Kurulu, daha sonra 21 Ağustos 1965'de, 6 kişi'ye çıktı. Rahmetli Faik Bucak'ın iştirakiyle Parti Programı'nın altına, şu takma isimlerle imzalarımızı koyduk: Zınar: Başkan, Peşmergeyê Welat: Sekreter, Evindarê Welat: Mu- hasip, Dûrnas, Jîrek ve Bendeyê Welat, üyeler'dir. Sırasıyla isimlendirirsek: Faik Bucak, Said Elçi, Sakir Epözdemir, Dûrnas (adının açıklanmasını istemiyor), Derviş Akgül ve

ömer Turhan'dırlar. Bu 6 kişiye ilaveten, 1968 yılı başında Feqi Hüseyin Sagnıç da, Merkez Komitesi'ne alınmış idi. Ancak, Merkez Komitesi öyeliği, Feqi'ye tebliğ edilemeden tutuklandık.

1968 yılının 20 Ocağı'nda yakalandık. 11'i tutuklu, 5'i tutuksuz olmak üzere, 16 sanıklı bir "TKDP Davası" başladı. "Antalya Davası" diye bilinen bu dava ile biz, Dr. Şıvan'la tanıştık. Feqi Hüseyin Sagnıç, tutuksuz yargı- lanan sanıklardan biriydi. Said Elçi, Ömer Turhan, Derviş Akgül ve Şakir Epözdemir (ben), tutuklu olarak yargılanmak- tayıdık. Demek ki, Merkez Ko- mitesi olarak, komple cezaevinde idik. (tabii, Feqi hariç.) Dürnas arkadaşı- mız, hem asker idi, hem de askere giderken görevini bırakmıştı. FaikBucak ise; Ağustos 1966'da katledilmiş idi.

Biz Antalya Cezaevi'nde tutuklu iken, Dr. Sait Kırmızıtoprak (Dr. Şıvan), Isparta'da sürgünde idi. Diyalogumuz burada başladı. Ancak bu diyalog, sadece Dr. Şıvan, Said Elçi ve Feqi Hüseyin Sagnıç arasın- daydı. Bu diyalogumuzun, 6 aylık süresine cezaevi dönemi dersek, diğer 78 aylık süre de, 1969'daki tahliye oluşumuzdan sonraki zaman diliminde devam etti. Bu konuda Said Elçi'den hiçbir bilgi almadık. Ancak, arasına Feqi Hüseyin Sagnıç'tan aldığım bilgiye göre; Dr. Şıvan'la birlikte 20-30 kişi Güney'e gönderilecek ve orada eğitilecek- ti; bu grubun çoğunluğu partimiz mensupla- rından seçilerek yol- lanacaktı. Dr. Şıvan'da dahil, bütün bu kadro, gelip bizim partimizin bünyesinde yer alacaklardı...

Hazırlıklar çok uzadı, gidegide bir kişi bizim partiden, 6-7 kişi de Şıvan'nın grubundan Güneye geçtiler. Bu arkadaşların geçişlerinden yaklaşık 6 ay sonra; Kürtler, Irak'ta Otonomi'ye kavuştular. Savaşta yararlı olan bu grup, IKDP yöneticileri ve askeri yöneticiler tarafından itibar kazanmışlardı. Dr. Şıvan, bu itibara bakarak, bize rest çekti. Feqi Hüseyin Sagnıç ve Said Elçi 1970'de, Dr. Şıvan'la birkaç kez görüştüler, konuştular, tartıştılar ve bir neticeye varamadılar. 1971 yılı başında bizler, (yani Parti'nin Kurucular Kurulu ve Koma Navkom üyeleri) akıllarına geldik!

Şark Matbaacılık ve Gazetecilik A.Ş.'nin, 1971 Diyarbakır toplan- tısı günü, biz hepimiz, (Dürnas da dahil olmak üzere) Diyarbakır'da toplandık. Toplantı, gecenin geç vakitlerine kadar devam etti. Feqi ve Said Elçi, gelişmeleri izah ettiler. Doktor, onları yanıltmıştı. Bizim hesabımıza, Güney'e giden doktor, kendi Partisi'ni kurmuş ve bizi res-

men aldatmış idi. "Çözüm nedir? Ne yapılmalı?" diye, soruluyordu.

Benim o geceki çözüm önerim şu idi: ..Arkadaşlar, biz bu Parti'yi kurduğumuzda, Dr. Şıvan'a güvenerek mi kurduk? Biz, bu Parti'yi, halkımıza ve kendimize güvenerek kurduk. Biz, özellikle 1967'de çok iyi neticeler aldık. 1968 yılına girdiğimizde de, Suriye'den gelen Reşidê Hemo'nun tecrübe- rinden yararlanarak, örgütümüzü güçlendirdik. Biz, en iyi süreçte iken yakalanarak, tutuklandık. Cezaevinde ve Türk Mahkemeleri önünde en iyi sına- vı verdik. Tabanımıza karşı ayıp sayılabilecek herhangi bir şey yapmadık. Tabanımız duruyor. Bu potansiyel, daha da büyümüş. Ben, daha Antalya Cezaevi'ndeyken söylüyordum, yine aynen tekrar ediyorum: Lütfen, biz işimizi yapalım! Örgütümüzü belli bir noktaya getirirsek, Doktor da, dünya da bizi kabul eder; yok eğer, zayıf bir noktada isek, zaten kimseye yaramayız. Doktor ve onun örgütüyle kesinlikle sataş- maya girmeyelim; dost kalmaya ö- zen gösterelim ve işimize bakalım."

Benim bu teklifim kabul gördü. özellikle, Dûrnas arkadaş beni destek- ledi. Dûrnas arkadaşın söylediklerini aynen aktarıyorum: "Ben, Şakir'in de- diklerine aynen katılıyorum. Gaye, biraz demokrasi ve özgürlüğe kavuşmamız ise, bunu ha biz gerçekleştirmişiz, ha Şıvan... Fark etmez; yeterli halkımız, bir an önce amacına ulaşsın! Sizin söylediklerinize göre; Şorış (Irak Kürdistan Devrimi) Doktor'u destekliyor veya bazı yöneticilerinden cesaret alıyor! Eğer, böyle bir olgu varsa, bizim Doktor Şıvan'la sürtüşmemiz doğru olmaz. Zira, onları da karşımıza almış oluruz ki, biz, böylesine ağır bir yükü taşıya- mayız. Ben Doktoru, hepinizden daha iyi tanırım. Benim haberim olsaydı; işin başında bu ilişkinize mani olurum. Bir defa, Doktor, çok kaprisli bir kişiliğe sahiptir. Kürdistan Devrimi'nin sempatisini de almışsa, artık onu durdurabilecek hiç bir kuvvet yoktur. Boşuna onun- la uğraşmaktansa, kendi Parti faaliyetlerinize başlayın ve güçlenmeye bakın."

Arkadaşlar oybirliği ile bunu kabul ettiler. Said Elçi ve Derviş Akgül bir teklif getirdiler. Nüfuzlu ve aynı zamanda bizce tereddütle karşılanması gereken bir kişi Hac'dan dönerek Güney'e uğramış ve üst düzeyde misafir olmuştu; bu kişi ile ilgili kuşularımızı bildirmek için bir mektup yazılmış idi. Bu mektubu, IKDP'ye ulaştırmak istiyorlardı. Biz, "gerek yok" dedik. özellikle, Dûrnas arkadaş bu mektubu gönder-

menin taraftarı değildi. O, "ne Zaxo'daki yöneticilerle ne de Şıvan'la muhatap olmamızın doğru olmayacağı" düşünüyordu. Ama, Derviş ile Said arkadaşlar ısrar ettiler. Zira, mek tubu gotürecek kişi de mahkum imiş; oraya iltica etmek istiyormuş. O kişinin, kim olduğunu hatırlamıyorum.

Adı geçen kişi mektubu götürdü; İsa Sıwar'a ulaştı, ama kötü haberlerle gerisingeriye dönmek zorunda kaldı. İsa Sıwar, mektubu açmadan yırtmış ve çok sinirlenerek, şunları söylemiş: "Git söyle, bir daha Derviş ve Sa- id'ten ne mektup gelsin, ne de adamlarını buraya yollasınlar. Biz Dr. Şıvan ve Partisi'nden başkalarını tanımıyoruz." demiş... Bu sözlerden dolayıdır ki, bir paniktir başladı.

Panik, Nisan 1971'de başlamıştı; Mayıs'ta beni, Dr.Şıvan'la görüşmeye gönderdiler. Yine, Şıvan'ın peşine düştük. Parti çalışmaları, başka bir bahara kaldı. Ben, Silopi'de Çeko ile buluşarak, Şıvan'ın Karargahı'na git- tim. Biz oraya varmadan Doktor haber salmış: "Durmasınlar , Çeko ve Şa- kir Türkiye'ye dönsünler, biz burada buluşuruz." demiş.

Bunun üzerine, biz de Hakkari üzerinden Türkiye'ye döndük. Döndükten 5-10 gün sonra, Doktor Tatvan'a geldi. Ben, O ve Feqi, bir gece sabaha kadar münakaşa ettik. O, bizim hiçbir önerimizi kabul etmedi ve adeta bize dikte ettirircesine şunları söyledi:

"Çok fazla deşifre oldukları için Derviş ve Said hariç, merkezdeki bütün arkadaşlarınızın, bizim Parti Merkezi'nde görev almalarında sakınca görmüyorum. Said Elçi bizim büyüğümüzdür. Gelsin Meqer'de otursun, bizi yönlendirsın veya Avrupa'ya gitsin, bizi temsil etsin ya da Türkiye'de evinde otursun. Derviş Akgül de, bir müddet evinde otursun veya Irak'a geçsin; orada çalışmalara devam etsin. Bunu yapmıyorsanız; sizin yolunuz başka, bizim yolumuz başkadır."

Böylece, görüşmemiz noktalandı. Doktor Şıvan'la görüştüğümüz günü, şimdi tamimatına hatırlayamıyorum. Ancak, görüşmemizle, 12 Mart 1971 Muhtırası'nı izleyen "BALYOZ HAREKATI" arasında 23 günlük bir zaman vardı. Biz Feqi ile bir sonraki gece oturup, arkadaşlarımızla görüşmek ve Doktor Şıvan'la görüşmemizin sonuçlarını kendilerine anlatarak, bir karara varma gereği üzerinde durduk. Feqi, Said ve Derviş ile görüşecekti. Ben, Ömer ve Dürnas'la temas kuracaktım. Galiba, aradan 2 veya 3 gün geçmişti. Biz, daha arkadaşlarımızla görüşmeye gitmeden, 12 Mart BALYOZ HAREKATI

ile ilgili tutuklamalar başladı. Bu sırada, Feçi de tutuklandı. Ben, Erzurum yolu ile Adana'ya gittim. Adana'da Derviş Akgül ile karşılaştım ve Said Elçi'nin eşi Saime Hanım'ın, Adana'da Bahattin Seydaoğlu'nun evine misafir geldiğini öğrenerek, Derviş'le gidip, kendisiyle görüştük. Ben ve Derviş, Said Elçi'nin Suriye'ye geçtiği haberini de, ilk olarak, Saime Hanım'dan öğrenmiş olduk. Bu tarih; takriben 24-25 Mayıs 1971'dir...

Benim Suriye'ye veya Irak Kürdistanı'na geçmeye hiç niyetim yoktu. Derviş arkadaş ısrar etti; gidemesem de, kendisinin mutlaka gideceğini bili-yordum. Derviş arkadaşı yalnız bırakmak istemediğim için, mecburen ben de, kendisiyle birlikte gitmeye karar verdim.

Derken, yolculuk başladı. Yolculuğu, aynı otobüsle değil; ayrı ayrı otobüslerle yaptık. Derviş'i bir gün önce gönderdik; ertesi gün de, ben ve Mela Yunus Kaya birlikte yola çıktık. Yolculuk boyunca, güvenlik nedeniyle, hiçbir şekilde birbirimizin isimlerini karşılıklı olarak telaffuz etmemek için, takma isimlerimizi belirledik ve birbirimize bu takma isimlerimizle hitap ettik.

Cizre'de belirli bir noktaya geldiğimde, bana soruldu: .. "Selaheddin Siz misiniz?" "Evet" dediğimde, "Derviş'in Suriye'ye geçtiğini ve beni de hemen O'nun yanına götürebileceklerini" söylediler. Biz, hemen karşı tarafa geçtik. Dicle'nin Xabur'a kavuştuğu noktadaki sınıra yakın bir köye vardık. Köyde rahmetli Cigerxwin, Reşidê Hemo ve Hemidê Hacı Derviş beni karşıladılar.

Ben daha oturmadan, Derviş Akgül kulağıma eğilerek; "Said Elçi'nin kayıplara karıştığını" söyledi. Suriye'ye vardığımız ve Said'in kayıp haberi- ni aldığımız gün, tarih, 8 Haziran 1971 idi.

Biz, iki hafta Suriye'de kaldık. Said ile ilgili araştırmalar yaptık. Mela Yunus'u, Zaxo'ya gönderdik. Ahmedê Hıso'yu görüp, geniş bilgi aldık ve Said Elçi'nin Zaxo'ya gittiğini, IKDP'nin bölge binası'nda misafir kaldığını ve oradan ayrılarak, Dr. şıvan'nın kaldığı Dışêş'e doğru götürüldüğünü öğrendik.

Bu bilgileri değerlendirdikten sonra, Said Elçi'nin izini takip etmeye, arkasından gitmeye ve O'nu bulmak için, çareler aramaya karar verdik.

Dehamê Miro'nun, Qiyadeya Muwaqqat (geçici komite) örgütü, bizi 23 Haziran 1971'de Musul'a götürdü. Musul'da Derviş'ten ayrıldık. Ben ve Yunus Kaya, Zaxo'ya hareket ettik. Derviş ise,

Gılala'ya gitti. Derviş ile vedalaşırken bana; "Şıvan'ın yanına gitmenin yalınış olacağını, Dr. Şıvan'ın beni de öldürebileceğini" söyledi. O ana kadar, Said'in öldürülebileneceği ihtimali dahi, kimsenin aklından geçmemişti. Bu nedenle, Derviş'in bu sözlerine biraz kızarak; "Derviş, ben seni akıllı biliyordum!" dedim.

Derviş: "şimdi, kimin akıllı, kimin deli olduğu belli olacak!" diyerek ayrıldı.

Mela Yunus Kaya ile birlikte Zaxo'ya geldiğimizde, evvela, Mihemedê Palolu'ya uğradık. Mela Mihemed, rahmetli Said'i Parti Merkez Binası'nda ziyaret etmiş; O'nun, Çeko ve Brûsk ile görüşmelerine şahit olmuştu. Ben, Mela Mihemed'e, Dr. Şıvan'ı sorudum ve "hemen O'na ulaşmak istediğimizi" beyan ettim.

Mela Mihemed; "Doktor'un Gılala'da olduğunu, O'nu hemen görebilmek için de, Zaxo Bölgesi IKDP Başkanı Osman Qazi'den izin kağıdı almam gerektiğini" söyledi.

Bunun üzerine, ben hemen Parti Merkezi'ne koştum. Osman Qazi'nin, evinde olduğunu öğrenince, evine gittim. Kendisiyle, bu konuyu görüştüm. "Hemen Dr. Şıvan'a ulaşmak istediğimi, bunun da çok acil olduğunu, Said Elçi'nin arkadaşı olduğumu; Doktor'la birleşebilmek, dayanışma içinde olmak ve dost kalabilmek için, Said'in incitilmemesi gerektiğini" anlatarak; "edindiğimiz bilgilere göre, Said'in bir aydan beridir kayıp olduğunu, Zaxo'ya geldikten Sonra 3 gün Parti Merkezi'nde misafir kaldığını..." söyledim.

Osman Qazi; yeminbillah ederek; "Said'i görmediğini, eğer Parti'de misafir olmuş olsaydı, bundan mutlaka haberi olacağını, oysa böyle birşeyden haberdar olmadığını..." belirttiikten Sonra; "...bana da talep ettiğim izin kağıdını veremeyeceği için üzgün olduğunu; benim yapabileceğim en iyi şeyin de, benim Dışêş'e, Şıvan'ın Meqeri'ne gidip, Doktor'u orada beklemek olduğunu..." söyledi.

Osman Qazi'nin bu sözleri, moralimi bozdu. İtiraf edeyim ki, birkaç saat önce, Derviş'ten ayrıldığımı binpişman olmuştum. Hemen, telefon ya da telgrafla, Derviş'e ulaşmak istiyordum.

Osman Qazi'den ayrıldıktan sonra, doğruca, Mela Mihemedê Paloluya gittim. Hoca, (yo1 parası bana ait olmak üzere) Gılala'ya bir kurye gönderdi.

Kurye ile Derviş'e gönderdiğim mektupta, özetle şunları

yazmıştım: "Derviş! Dr. Şıvan, Gıla'ladır. Osman Qazi, Kürdistan'ın başına yemin ederek, Said Elçi'den haberdar olmadığını söylüyor. Ben, bilmeceburî Doktor'un Meqerî'ne gidiyorum. Doktor'un aleyhinde konuşma ve kendine iyi bak, dikkatli ol!"

Di sala 1959-an de, bi tesîra bûyerên dinyayê û pêşketin, guherand- inên serkanî-dînamîk yên kurdî, rewşenbîrên kurd, ketibûn nav tevgerê civakî-kulturî û livandineke meşrû û sivik. Lêbelê ew livandina, ji aliyê Komara Tirkîyeyê ve, hat tewandin û 50 rewşenbîr û xwendewanên Kurd, di hepsên leşkerî de hatin zindan kirin: Ev doz pişt re bi "DOZA 49- an" hate bi nav kirin.

Dr. Seîd Kırmızıtoprak jî yek ji wan 49 rewşenbîrên Kurd bû. Piştî ku çû Başûrê Kurdistanê wek navê mûstear û rêxistinî, Dr. ŞIVAN bi kar anî. Ji bona vê yekê jî, jenerasyona nû ya xort, Dr. Seîd Kırmızıtoprak, bi navê wî yê rêxistinî nas dikin.

Dr. Seîd Kırmızıtoprak, ji "Doza 49-an" ceza girt û sirgûn bû. Piştî ku ceza girt, qasî ku ez dizanim di tu partiyan de bi aktîfî kar nekir. Lê belê di kovar û rojnameyên Kurd û Tirk de, nivîsar nivîsandin. Di Partiya Karkerên Tirkîyeyê (TÎP) de kar nekir. Lê belê wusa diyar bû, ku bi gurubên xort yên Kurd, ku li metropolan dijiyan re xwediyê pêwendîyan bû. Dîsa wê demê bi Partiya Demokrat a Kurdistanê a Tirkîye'yê (PDKT) re û bi taybetî bi sekreterê giştî yê partiye Seîd ELÇİ' re xwediyê pêwendîyan bû.

Sala 1969-an, ji bo Kurdan saleke girîng bû. Lewra pirsê Kurd, bi fikir û bi rêxistinê derdikete ser qada (seheya) hukukî, legal: Bi taybetî jî li bajarên metropolê, li Enqereyê û Stenbolê pirsê Kurd legalîze dibû .

PDKT, di sala 1965-an de hatibû damezirandin. Tesîra xwe, bi taybetî, di xwepêşandinê (mîtingên) salên 1967-69-an dabû der û dorên xwe. Li axa Kurdan pêşbûna xwe diyar dikir. Hêdî û hêdî li ser gurubên biçuk yên Kurd, ku li bajarên metropolê dijiyan tesir dikir.

Beşek rewşenbîr û xwendewanên Kurd jî di TÎP-ê de xebata xwe dimeşandin.

Di wan salan de pirsê Kurd, kete rojeva tevgera çep. Ew teori û nerînên, ku heta wê rojê ji bona pirsê Kurd hatibûn parastin, bersiva hewcedariyên pirsê Kurd vedikirin. Ji bona vê yekê rewşenbîr û xwendewanên Kurd, hewcedariya konseptê nû ya fikrî û rêxistinî dîtin: Di sala 1969-an de, pêşî li Enqereyê, pişt re li Stenbolê û bajarên Kurdan (1970), DDKO hate damezirandin.

Di vê pêvajoya pirsê Kurd de, Seîd Kirmizitoprak xwediyê rolekê nebû, an jî mirov dikare bibêje, ku xwediyê roleka mezin û diyar nebû.

Ahmet KOT AN (Reşo ZÎLAN) û Hikmet Buluttekin (Çeko), hîmdar û damezrênerên DDKO-ya Enqereyê bûn. Piştî ku DDKO hat damezirandin demeke kurt, ew herdu hevalan dev ji Enqereyê berdan: Lewra Ahmet Kotan di nav xortên Kurd de mirovekî xebatkar, aktîf, jêhatî û xwediyê tesîreke fikrî û rêxistinî bû. Ya Çeko nebe jî, di demeke kurt de valahîya A. Kot An xwe da derva.

Derket holê ku herdu hevalan çûne Başûrê Kurdistanê. Wek îro Kek Şakir Epözdemîr behs dike, wê demê jî, di çûyina wan a Başûrê Kurdistanê de sê nerîn hebûn.

Gorî nerînekê, Dr. Seîd Kirmizitoprak û hevalên bi wî re çûne Başûrê Kurdistanê, bi alîkariya PDKT-ê û lêbelê xweser (serbixwe) çûne Başûrê Kurdistanê. Ewê li wir xebateke xweser bikin û di encamê de partiyekê ava bikin.

Nerîna duyemîn jî ew bû, ku Dr. Seîd û hevalên bi wî re çûne Başûrê Kurdistanê, endamên PDKT-ê ne û girêdayî PDKT-ê de xebateke taybetî û perwerdekirinê bimeşînine.

Nerîna sêyem ew bû, ku herdu teref dê yekîtiyê bi dar xin.

Gelo wê demê pratîk û jiyana siyasî ya Kurd çî nîşan dida, pêwîst e, ku mirov li wê binêre.

1. Di nav DDKO-yan de gurubeke xurt ya xebateke illegal, çekdar û "Şoreşa Millî û Demokratîk a Kurd" diparastin derketibû holê. Ew guruba jî, çep û sosyalîst bû. Piştî demekê jî, bi dengê bi Şivancîyê ew guruba dihate bi nav kirin. Ew guruba, li dijî, TÎP-ê ew kesên DDKO damezrandibûn û milletperweriya PDKT-ê bûn.

2. Di havîna 1970-yî de DDKO biryara xebata herêmî dabû. Ji bona vê yekê gurubên DDKO-yê çûbûn herêmên Kurdan. Dema ku vegeeriyên, ji konseptê nû ya derveyî TÎP-ê, DDKO-yê û PDKT-ê behs dikirin.

Di wan danûstandinan de derketibû holê ku beşek endamên komîta Merkezî û endamên Komîteyên Herêmê yên PDKT-ê jî angajeyî (hevgerî dayî) guruba Şivan bibûn û propagandêke taybetî dikirin: Feqî Hûseyînê Tatwanî yek ji wan kesên diyar bû.

Feqî Hûseyînê beriya, ku kûştina Seid ELÇÎ jî bê bihistin, ji Dr. Şivan re hevalbend qezenç dikir. Piştî ku mirina Seid ELÇÎ zelal bû, jibo partiya Şivan (Partiya Demokrat a Kurdistanê li Tirkîyeyê-PDK) dixwest endaman qezenç bike û di eynî demê de ji bona ciyê Çeko, Brûsk û Şivan bê dagirtin, li eleman û qadroyan digeriya.

3. Di sala 1970-yî de, wek her deman mûnaqeseyên hatin û nehatina cuntaya (darbeya) leşkerî hebû. Ji bo darbeyê pêngav dihatin avêtin. Ji bona ku azadî û demokrasiya nisbî ya heyî ji holê rakin, qanûnê nû, Qanûna Parastina Qanûna Esasî dihat xwastin, ku ji Meclîsê derbas bikin. Hêzên çep û demokratîk jî li dijî vê qanûnê bûn. Bi taybetî jî, ev qanûna jibo Kurdan û welatparêzên Kurd gelek girîng bû. Ji bona vê DDKO-yê jî biryar da, ku li dijî vê qanûnê derkeve û beşdarî xebata hevdijîya vê qanûnê bibê.

Ji bo organizekirina vê xebatê, DDKO-ya Enqereyê civînek pêk anî. Ji derveyî endam û berpirsiyarên DDKO-yê rewşenbîrên Kurd yên li metropolan û yên li Herêmên Kurd bûn jî beşdarî civînê bibûn.

Ew rewşenbîrên ku ji herêmên Kurd hatibûn, ji xebateke cihê ya rêx- istinî kiribûn. bi taybetî jî, Endamê Komîta Giştî û Sekreterê Giştî yê TÎP-ê Dr. Tarîk Zîya EKÎNCÎ jî tehlûkekê behs dikir. Digot ku "ew tehlûkeye çekdar, maceraperest û çeprew e."

Qesta wî û wan jî, tevger û rêxistina Dr. Şivan bû. Ew bûyer jî

derdixin holê, ku dema Dr. Şivan çûye Başûrê Kurdistanê, ne xwediyê partiyekê be jî, xwediyê rêxistineke teng e û piraniya hevalên bi wî re çûne jî, ji vê rewşê agahdar nînin.

Bûyer, helwesta Dr. Şivan û yên hevalên wî û agahdariyên, ku min û reya giştî ya Kurd ji hevalên Dr. Şivan û berpirsiyarên PDK li Tirkiyeyê girtine, piştî Dr. Şivan çûye li Başûrê Kurdistanê bi cîh bûye, wek grubek û rêxistineke xweser/serbixwe hereket kiriye. Di nav pêvajoyeke kurt de Dr. Şivan xwestiye, ku mesafeya xwe ya PDK-a Tirkiyeyê, Seîd ELÇÎ veke.

Wek min li rêzên jorîn jî behs kir, beşek hevalên Dr. Şivan dema ku çûbûn Başûrê Kurdistanê, li Tirkiyeyê ji derveyî PDK a Tirkiyeyê û Seîd Elçî ne: Ew di nav xortên Kurd de xwediyê rêxistinekê ne. Navê vê rêx- istinê KAK (Komela Azadiya Kurdistanê) e. Lê belê zêde ji Seîd Elçî û ji partîya wî ne dût in. Dema ku bi Dr. Şivan re ew çûne Başûrê Kurdistanê, bi armanc, raman û dilsoziya yekîtiyê çûne. Lêbelê piştî, ku çûne Başûrê Kurdistanê û di nav xebat û demê de dîtine, ku Dr. Şivan ji armanca yekîtiyê dût hereket dike û gruba xwe ji aliyê rêxistin de dixwaze hişk û bigî- hîjine formeke partiyeke xweser, ji Dr. Şivan vediqetin û dût dikevin.

Ez di vê baweriyê de me kek Reşo Zîlan di derheqa vê pirsê de xwediyê agahdarî û zanyariyeke kûr û fireh e.

Min, Seîd Elçî û Dr. Şivan Çiqas Nas Dikir?

Pêwendiya min bi qadroyên sîyasî yên kurd û rewşenbîrên Kurd re, di sala 1967-an de, bi xwepêşandina yekemîn a ku Kovara *Ötügen* û *Millî YOL*, yanî nijadperestên Tirk hat protesto kirin ve dest pê kir. Di sala 1967-an de dema ku ez li Zanîngeha Huquqê li Enqereyê bûm xwendevan, ew pêwendiyên min pêş ketin.

Bi taybetî jî dema, ku ez bûm damezrêner û hîmdarên DDKO-ê û berpirs di DDKO-yê de, danûstandin û pêwendiyên min, bi qadroyên kurd re xurttir, kûrtir û firehtir bû. Di wê merhelê de min, Seîd Elçî û Dr. Şivan jî nas kir. Lêbelê bi wan re danûstandin û pêwendiyên min, dût û dirêj nebû; bi hev re em beşdarî xebatekê jî nebûn: Min, Seîd Elçî du caran û Dr. Şivan carekê dît.

Helbet rewş û îmkanên min, ji derveyî hevdfîtin e, girêdayî xebat û pozîsyona Seîd Elçî, hîn zêdetir bû, ku wî nas bikim.

Seîd Elçî, her çiqas ji aliyê grub û rewşenbîrên kurd ve dihat rexnekirin û îdeolojî û felsefe-siyasete wî nedihat ecibandin jî, hemû rewşbîrên kurd û gel, ji wî hez dikir.

Seîd Elçî, kurdperwerekî gelek bi heyecan û dilsoz bû. Di pêwendiyên xwe de nerm, bi ilim û maqul bû. Her demê li yekîtiya kurdan digeriya. Ji bona wî, ji îdeolojî-felsefeyan girîngtir, kurdperwerî bû: Kesekî ne çep bû. Beşek rewşenbîrên Kurd di wê rayê de bûn, ku ew li dijî çepîtî, sosyalîzm û çepan e. Lêbelê dema, ku min naskir ez çep bûm, di wî de min ew karakter nedît.

Ew ne çep û ne sosyalîst bû, lêbelê wî xwe wek kesekê "rast" bi nav nedikir.

Seîd ELÇÎ her çiqas beşek çepên/sosyalîstên kurd yên di TÎP-ê de xebat dikirin, ji yekîtiyê û ji kurdperwerên ne sosyalîst xwe didan aliyekî jî, wî dixwast ku pêwendiyên "çep" û "rast"an germ û xurt bibe

Bi taybetî jî dema, ku şert hatin guhertin û ji bo pêwendiyên du tere- fan têgihîştin û mecbûriyetî hatin holê, di "Doğu Kalkınma Mitingleri-Xwepîşandanên Pêşvebirin, Pêşxistina Rojhelatê" de, pêk hatina lihevkirina çep û "rast"an de, rolekî girîng lêhîst.

Piştî ku DDKO hate damezirandin, pirsra Kurd kete rojeva siyasete çep û giştî ya Tirkiyeyê, ew pêwendî û lihev kirin hatibû merheleke nû û girîng. Çep û "rast"an bi hev re biryar dan, ku *Şark Yayıncılık Ve Gazetecilik A.Ş. -Şirketa Anonîm a Rojnamevanetî û Çapemenetî A Şark..* damezrînin.

Wusa diyar dikir ku Seîd ELÇÎ ne êrişker û ne xwediyê îhtîrasê bû. Dr. Şivan, çep û sosyalîst bû. Jêhatî û xwediyê zanyariyeke dîrokî, çep bû. Mirovekî gelek bi heyecan, bi îxtîras û ji xwe razî bû. Dema ku min bi wî re danûstandin kir, aliyekî wî yê nevekirî, yan jî, ji aliyê min ve nedihat îzah kirin û hê nayanaskirin hebû. Ew aliyê Dr. Şivan, him mirov ber bi xwe dikişand û him jî mirov ji xwe dûr dixist. Hezar mixabin wusa diyar dikir, ku armanc û ramanên wî ji mirovan girîngtir û muhîmtir bû...

Taybetiyeke wî ew bû ku her dem bibe mirovê yekem, helbet di siyasetê de jî, wusa diyar bû, ku çavê wî li serokî bû; Ji bona serokî jî, xwediyê potansiyekê bû.

Helwestên wî, helwesta mirovekî çep û radîqal; mirovekî edetî yê ku şerfiroş û şerker bû.

Ew taybetiya wî ya serokî, heyecanî û şerkerî; helbet ji bona wî feq- kemînek jî çêdikir: Ew feqa jî ew bû, ku ji bona bigihîje armancên xwe, rê û rêbazên çanda Şerqî bimeşîne û pêk bîne. Dema ku di wan de jî bi ser nekeve, zorê bi kar bîne.

Ew nerînên min, helwesta wî ya ku beriya biçe Başûrê Kurdistanê; di pêwendiyên wî qadroyên siyasî de û piştî ku çûye başûrê Kurdistanê di xebata wî de, tèn dîyar kirin û îspat kirin.

Dema ku xebata Dr. Şivan ya wê demê bê lêkolîn û şirovekirin du-sê xalên girîng tèn holê: **1.** Dr. Şivan, ji bona ku qadroyan bikîşîne nav xebata xwe, gelek qadroyên siyasî tehdît kirine û zor daye wan. **2.** Dr. Şivan, gelek kesên li dijî hevûdu di xebat û rêxistina xwe de rêxistiyê û gihandiyê hev. Van kesan jî, ji hevûdu agahdar nekiriye. Ji bona wê jî, dema ku li ciyan jî ew rastiya derketiyê holê, beşek kes ji berpersiyariyê bi awayekê jakobenî dûr xistiye û komîte fesih kiriye. **3.** Dr. Şivan, gelek qadro, endam û berpirsiyarên Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyeyê, hevlên Seîd Elçî rêxistiyê, bi gruba xwe hevgerêdana wan pêk aniye. Îzin daye, ku endametiya wan jî dualî dom bike.

Gorî baweriya min û min her demê jî ew parastiyê, ku ew pozîsyon û helwestê, ji bûyera trajedîk a Seîd Elçî û Dr. Şivan re şert pêk anîne, zemîneke qirêj ava kiriye.

Min, Bûyer Kîngê, Û Li Ku Û Çawa Bihîst?

Ez, jibo ku berpirsiyar û serokê DDKO-ya Enqereyê bûm, di Îlona 1970-yê de bi grubek endam, damezrênerên DDKO-yê û rewşenbîrên kurd ve li Enqereyê hepis bûm. Mehkeme hîn li Enqereyê didomand, Muxtiraya 12-ê Adara 1971-an hat dîyar kirin.

Di 26. 4. 1971-an de, DDKO hatin qedexê kirin û berpirsiyar, endam û damezrênerên DDKO û hevalbendên TÎP-ê kûtlewî hatin hepis kirin.

Di encamê de ji aliyê karbidestiya leşkerî-siwîl ve biryar hat girtin, ku ew kes û grubên girêdayî pîrsa kurd hatine hepis kirin û dê bên mehkeme kirin, li Diyarbekirê bên civandin.

Di meha şeşan de (1971); ez, Mûmtaz Kotan, Sabrî Çepîk û Nezîr Şemikanlî, em ji hepisxaneyê Enqereyê çûn hepisxana leşk-erî ya Diyarbekirê: Lewra ji wan kesên di sala 1970-yê de hatibûn hepis kirin, bes em çar heval di hepsê de mabûn, hevalên din yê bi me re hatibûn hepis kirin (Dr. Tarik Zîya Ekîncî, Nivîskar û muftî M. Emîn Bozarslan, Canîp Yildirim-Huquqzane-, Musa Anter); hatibûn tehlîye kirin.

Dema ku em çûn hepisxaneyê Diyarbekirê, xwedî bîr û bawerî û rêxistinê kes û grup ji hevûdu veqetîya bûn: Her çiqas sedî-sed nebe jî, hevalbendên Seîd Elçî û Dr. Şivan jî wek du grubên cihê siyasî xwuya dikir.

Di wê atmosferê de, pirsê yekîtiya PDK a Tirkîyeyê û hevalên Dr. Şivan dihat qise kirin û li ser sedemên biserenketina yekîtiyê axiftin dibû, şîroveyan cûr be cûr dihatin kirin.

Di nav vê pêvajoyê de, kûştina Sedîd ELÇÎ li nav hepisxaneyê bi awayekî nîzîm bela bû. Wextekî dirêj neçû, ewuqatên me ew nûçeyê trajedîyê gîhandin me.

Di eynî pêvajoyê de, Wezîrê Derve yê Komara Tirkîyeyê jî diyar kir, ku hemwelatîyên wan li Îraqê, li Herêma Otonomiyê hatine kûştin; ew daxuyaniya bi rêya radyoyan hat belav kirin.

Berîya agahdariya radyoyê, ev bûyerê trajedîk wek bombayekê hatibû girtîxaneyê, bi radyoyê eynî bûyerê wek bombayekê ketibû nav gelê Kurd. Piştî wê demê, bûyerê Seîd Elçî û Dr. Şivan vekirî, kûr û dirêj hat mûnaqêşe kirin. Ev mûnaqêşeyan bûn sedem, ku nerînê cihê û cihê; terefên cûr be cûr derkevin holê. Lêbelê di wan mûnaqêşeyan de, helwestê subjektîf (şexsî), neobjektîf û terefîr giraniyê çê dikir.

Girêdayî mûnaqêşeyên nav girtîxaneyê sê nerîn, teref û balê fikrî-şexsî derketibûn qada hepisxaneyê.

Nerîna yekem ew bû, ku "Dr. Şivan ajanê dewletê bû. Ji bona pêşîya tevgera welatparêz a Kurd bigre, çû, an jî hate şandin Başûrê Kurdistanê. Di encamê de Seîd Elçî kûşt..."

Ev nerîna jî aliyê hevalbendên PDK a Tirkîyeyê dihat parastin. Bi taybetî jî, ji aliyê Awuqatê Yusuf EKÎCÎ ve dihat belav kirin. Girêdayî wê helwestê ez û kesên din têgihîştin, ku Ewuqatê Yusuf EKÎNCÎ, hevalbend û endamê PDK a Tirkîyeyê ye.

Awuqat Yusuf Ekinci, piştî ku ji hepsê hat berdan, dev ji Kurdîtiya siyasî berda. Ez wê demê di wê nerînê de bûm, ku jiber du sedeman Yusuf EKÎNCÎ dev ji kurdîtiyê berdabû hebûn. Yekem sebeb, ew tirs û zehmetiya rejîma 12 Adar a 1971-ê bû. Sedema duyem, ku bûyera trajedîk a Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan bû.

Feqet dema ku Yusuf Ekinci hate kûştin, min maneyeke taybetî neda kûştina wî. Ji bona ku Yusuf kurdîtiyeke vekirî û rêxistinî nedikir, kûştina wî ji bona min bû şokekê. Ez di wê baweriyê de me, ku ji bona piraniya qadroyên siyasî yên kurd jî, tesîr kir.

Helbet di vê nerînê de terefîriyeke xurt û hîsî hebû. Nerîna duyem ew bû, ku "Seîd Elçî ji aliyê Dr. Şivan ve nehatiye kûştin. Seîd Elçî û Dr. Şivan, ji aliyê berpirsiyarên PDK a Iraqê û otonomiyê ve hatine kûştin. Ev bûyera, ji bona pêşiya tevgera Kurd ali Tirkiyeyê û bi taybetî jî, ji bona pêşiya Tevera Çekdar a Dr. Şivan bê girtin, hat qewimandin. Lewra, ew bi emir û daxwaza Tirkiyeyê hat çêkirin û berpirsiyarên Otonomiyê û PDK a Iraqê bi Tirkiyeyê re dost, hevalbend û xwediyê pêwendiyên e..."

Ev nerîna jî terefîrî û nerîna hevalbendên Dr. Şivan bûn. Nerîna biçek bêterefîrî û objektîf xwîya dikir ew bû: "Dr. Şivan, Seîd Elçî kûşt, pişt re jî berpirsiyarên otonomiyê dadgehê şiklî ava kirin û cezayê kûştinê dan Dr. Şivan. Bi vî awayî, berpirsiyariya otonomiyê bi kevirekî du çivîk xistin."

"Berpirsiyariya Otonomiyê nedixwestin, ku tevgera çekdar li Tirkiyeyê bi destê Kurdan pêk bê. Dr. Şivan xwe ji bo karekî çekdar amade dikir. Lêbelê Dr. Şivan xwediyê îxtîras bû û ji derveyî xwe tehmûlî tu serok û rêxistina nedikir. Berpirsên otonomî û PDK a Iraqê jî ev yeka dizanîn û Dr. Şivan nas dikirin. Ji bona vê jî, Dr. Şivan baş bi kar anîn..."

Ez jî, encama agahdariyên min girtibûn-digirtin, ji pêvajoya bûyerê, xususiyeta ew kesên hatibûn kûştin û pêwendiyên wan, taybetiya wê demê, gihîştibûn qeneeta sêyem.

Dîsa dema, ku em di hepisxaneyê de bûn û van mûnaqeseyan dom dikir, li Diyarbekirê belavokek belav bibû. Di wê belavokê de dihat diyar kirin, ku kûştina Seîd ELÇÎ plan û qomploya komûnîsttan e. Ez şaş nebim, navê çend sosyalîstan jî di belavokê de dihat nivîsandin.

Gorê agahdariyên Kek Şakir Epozdemîr, serkaniya vê nerînê PDK a Iraqê û Îdrîs Berzanî ye. Lewra wî, bi Soro (Nazmi BALKAŞ) re, ji Îdrîs Barzanî ev nerîna guhdarî kiriye. Lê gorî belgeyên min di sala 1980-î de dîtibûn û xwendibûn, serkaniya vê nerînê Soro (Nazmî BALKAŞ) ye: Çima serkanî Soro ye, ezê di rêzên pêş de diyar bikim.

Em, di sala 1975-ê, 13-ê Tîrmehê de bi efa giştî, ji hepisxaneyê azad bûn. Ew hevalên ku di dema bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan de li Başûrê Kurdistanê bûn, vegeyriyan welêt. Bi vegeyriyan wan, dîsa li ser bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan gengeşî germ û geş bû. Ji wan hevalan beşekî wan hîç nedixwest qise bike: Ew kesan, dikarim bibêjim, ku ji tevgera kurd bi tesîra vê bûyera trajedîk dûr ketin.

Hevalbendên Dr. Şivan zêde qise nedikirin. Dema ku qise dikirin, wê demê jî berpîrsiyarên PDK a Iraqê û otonomiyê bi awayekî giştî suçdar (tewanbar) dikirin.

Hevalbendên Seîd Elçî, jî ew nerînen xwe yê, ku min li rêzên jorî anîbûn ser zimên, diyar dikirin.

Bi kurtî dikarim bibêjim, ku guhartineke mezin bi giştî, di wan salan de jî nehat holê.

Di wê demê de bes bîr û reyên Ebdulkerîm Ceylan ê farqînî, ji bo min vekirî û zelal, objektîv dihatin.

Di navbeyna min û Ebdulkerîm de, piştî van salan dostanî, hevaltî û hevgerîdaneke gelek baş, hêja pêk hatibû. Navbeyna wî û hevalên Dr. Şivan yê kevin û nû, qet ne baş bû. Lewra nerînen wî, ji wan cihê bû. Lêbelê kek Ebdulkerîm Ceylan, zêde nêzikî hevalên Seîd Elçî jî xwîya nedikir: Yan jî ez wusa dizanime.

Kek Ebdulkerîm Ceylan, di derheqa vê bûyerê de gelek tişt ji min re behs kir. Lêbelê ji bona, ku ew nûha bi xwe ne sax e, ew nerînen wî ez bi detayan bînim ser zimên, mûmkin e, ku ez bibim sedemê spekülasyonê. Lê ji nerînen wî netîceten tiştên ez pêşkêş bikim ew in: "Seîd Elçî, ji aliyê Dr. Şivan de hate kûştin. Dr. Şivan bi îxtîrasa bû û Dr. Şivan bû qurabana îxtîrasa xwe. Hezar heyf, ku encama îxtîrasa Dr. Şivan, kurdan du serokên xwe wenda kir. Dr. Şivan bû qurbana îxtîrasa xwe. Dema ku biryara kûştina Seîd Elçî hatibû dayin, piraniya endamên Komîta Merkezî û Bûroya Polîtîk tune bûn: Mîrov dikare bibêje, ku Şivan ev biryara bi serê xwe

daye, bi yek-du hevalan jî daye qebûl kirin. Piştî ku bûyer deşîfre bû û derket holê, piraniya endamên komîta merkezî ya PDK li Tirkîyeyê ecizbûn û hevdişîtiya xwe diyar kirin..."

Ew pirsra min ya ku di derheqa rola berpirsiyarên PDK a Iraqê û otonomiyê de ji bona bûyerê, bersiva wî ew bû, ku "rolekî wan î diyar, min bi xwe tesbît nekiriye. Ez nikarim, bêbextiyê bikim..."

Lêbelê ev bersiva wî jî, di vê pirsê de nerînên min nediguherandin.

Belgeyên Ku Min Di 1980-î De Dîtibûn

Piştî 12-yê Adara 1971-an, Necmeddîn Bûyûkkaya yê Siwêregî jî derbasî Başûrê Kurdistanê bibû. Gorî wî ji min re behs kiribû û bûyera nîşanî min dida, Necmeddîn Bûyûkkaya beriya ku derbasî axa Başûrê Kurdistanê be, ne endamê PDK li Tirkîyeyê, yan jî ne hevalbendê Dr. Şivan e: Lewra her Kurdekî siyasî yê li Stanbolê gişî baş dizanî, ku hevalbendên Dr. Şivan bi tundî û xurtî li dijî Necmeddîn bûn û ji bona Necmeddîn ji kar û xebatên DDKO-yê Stanbolê dûr bixin hewl didan.

Necmeddîn, piştî diçe Başûrê Kurdistanê demekê dibe endamê partiya Dr. Şivan. Dema ku ji Ewropayê jî veşerîya welêt, wek berpirsiyarekî di dereca yekem de, ji bona PDK li Tirkîyeyê ji nû va ava bibe, bê rêxistin kirin, rolekî mezin lêhîst. Feqet, qasî ez dizanim di sala 1977-an, anjî dest pêka sala 1978-an de, bi hevalên xwe re kete nav hevçûdayîyekê û ji partyê veqetîya, yan jî hat bi dûr xistin.

Ez û Necmeddîn jî, piştî salên 1967-an hevalên hev bûn. Ez û ew, em di FKK'ê, TÎP-ê de endam bûn. Di sala 1969-an de, ez li Enqereyê û ew jî li Stanbolê bû damezrêner û berpirsiyarên DDKO-yê.

Di dawîya sala 1977-an de bi wesîleya yekîtiyekê pêwendiyên me dîsa nêzîk bû. Di navêna 1978-an de, piştî Rizgarîyê de cûd-abûn çê bû, pêwendiyên me nêzîktir bû.

Di salên 1978, 79 û 80-yî de, ez û ew, em gelek caran bi hev re çûn, beşa Kurdistanê a Îranê, Iraqê û Suriyeyê.

Di havîna sala 1980-yî de, ez û ew, em çûn Qamişloyê û li mala

dostekî bûn mêvan. Ew dostê me, dostekî hevalên Dr. Şivan bû û mirovên, wî yên malbatî li herêma Kurd a Tirkiyeyê hebûn.

Piştî bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan hevalên Dr. Şivan hatine li Qamişloyê man e, wê demê berpirsiyarên PDK li Tirkiyeyê, arşîva partiyê li cem wî dostê me hiştine: Wî ji bi salan parastîye. Pişt re gihîştibû wê qenatê, ku ew hevalên xwediyê emanetê, dê emanetê negirin; ew arşîva anî teslîmî min û Necmeddîn kir.

Min ji bona ku xwe xwediyê arşîvê nedidît, min arşîv negirt. Lêbelê Necmeddîn ji bona ku xwe berpirsiyar qebûl dikir, arşîv girt. Lê belê wê jî di arşîvê de bijartinek kir, belgeyên pêwîst girtin. Belgeyên din li cem wî dostê me ma. Pişt re ew belgeyan, ji aliyê Mahmud LEWENDÎ ve hatibûn girtin û li Swêdê hatin çap kirin.

Min pişt re ji çend hevalan re ji wan belgeyan behs kir û piştî ku li ser navê Necmeddîn pirtûka Kalemimden Sayfalar ji aliyê birayê wî ve hate çapkirin, ji bona ku agahdariyên şaş di pirtûkê de hebûn, min ji wan belgeyan, vekirî jî nebe behs kir.

Pêşî, Necmeddîn ew belgeyan ji çav derbas kirin. Dema ku wî ew belgeyan ji çav derbas dikirin, reng û şiklê wî dihat guhartin. Min jî wê demê fêm kir, ku di hundirê belgeyan de agahdariyên girîng û balkêş hene.

Pişt re, ji bona ku wî daxwaz kir, min jî ew belgeyan xwendin. Di nav belgeyan de sê belgeyên pîrr girîng hebûn. Ezê vekirî behsa wan bikim. Lê beriya wê ez dixwazim du-sê tiştan zelal bikim: Lewra ew berpirsiyariya min a dîrokî li hemberî Necmeddîn e jî.

1. Ez li wir têgiştim, ku agahdariya Necmeddîn ji biryara kûştina Seîd ELÇÎ tune ye. Lewra ew hîn di vê baweriyê de bû ku Seîd Elçî ji aliyê Dr. Şivan de nehatiye kûştin. Dema belgeyên heyî xwendin, ew jî şaş ma...

2. Me li ser bûyer û belgeyan qise kir. Min got, ku "di zelalkirina bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan de hûn xwediyê berpirsiyariyê û îmkanan bûn. We, ew berpirsiyariya xwe ya dîrokî bi cîh neanî. Bi wê helwestê, we li hemberî Seîd Elçî û tevgera Kurd, gunahkarî kir. Ji wê girîngtir jî heger we helwesteke berpirs diyar bikira, mûmkin bû, ku ew xwîna di vê demê de tevgera kurdan da tê rijandin, pêşî dê lê bihata girtin... Ez di wê baweriyê de me, îro jî wext ne dereng e. Piştî ku ev belgeyan ketin destê te berpirsiyariya te hîn zêdetir û

dîrokî bû. Pêwîst e ku tu ev belgeyan belav bikî..."

Bersiva wî wê demê ew bû, ku dê van belgeyan belav û çap bike.

3. Hezar mixabin, piştî demekê di helwesta Necmeddîn de guhartin çêbû. Necmeddîn, ji bona ku ji berpirsiyariyê bireve, xwe bide aliyekî; sedem çêkir û got ku "ev belgeyan hatine dizîn."

Ew kesê dizî jî, ez, an jî hevalekî min bû. Heger ew belgeyan di destê min/me de bûna, heta nûha me dê çap bikira. Yan jî min dê di vê merhelê de çap bikira.

4. Ez îro jî di wê baweriyê de me, ku heger Necmeddîn sax bûya, wîcdana wî jî piştî van mûnaqeseyan dest ne dida, ku belgeyan di destê xwe de bigre: Wî dê ew belgeyan çap bikira

5. Ew belgeyan di nav arşîva Necmeddîn de ne. Arşîva wî jî, li Swêdê li cern birayê wî ye. Birayê wî girêdayî wê arşîvê, li ser navê Necmeddîn pirtûkek çap kir.

Naveroka Wan Belgeyan Çi Bûn?

Helbet ji bona, ku belge ne di destê min de ne, ezê bes bi giştî behsa naveroka wan bikim. Helbet ew nerînên min jî, dê bi nerînên ew kesên, rast e rast û yan jî endîrek di nav bûyerê de bûn ve bèn qontrol û mûnaqese kirin.

Ez dixwazim ji sê belgeyan behs bikim.

1- Broşûra ji Aliyê Brûsk ve Hatibû Nivîsandin

Brûsk di wê demê de ji bona qadroyên partiyê broşûrek nivîsandiye. Ew broşûra, 30-40 rûpel e. Di broşûrê de analîza ordî û bûrokrasiya Komara Tirkiyeyê dike.

Di wê broşûrê de, ji pêwendiyê PDK a Tirkiyeyê û Seîd Elçî û qadroya wî ya dewletê û îstixbaratê dike. Lê dema ku behsa van tiştan dike, gorî ku dihat bîra min, gellek bi ustayî behs dike: Tê bîra min, ku ew ustadîya di broşûrê de min pêşkêşî bala Necmeddîn Büyükkaya kiribû.

Ew nerînên ku di dedreheqa pêwendiya PDK'a li Tirkiyeyê de ji aliyê Şakir Epozdemîr ve, di hejmarê 5-6-an ya WAR'ê de tê ser zimên, ku "Dr. Şivan xwediyê wê reyê bûye, ku PDK-a Tirkiyeyê

bi îstîxbaratê re di nav pêwendiyekê de ye, jî rast nîşan dide.

2. Biryara Bûroya Polîtîk

Bi destnivîsê sedemên biryara kûştina Seîd Elçî bi du yan jî bi sê rûpelan hatibû girtin. Ew destnivîsa, gorî Necmeddîn diyar kiribû, destnivîsa Dr. Şivan bû: Lewra min dest nivîsa Dr. Şivan û Çeko û Brûsk nas nedikir.

Di binê biryara kûştina Seîd Elçî de, îmzayên Dr. Şivan, Çeko û Brûsk hebûn.

Di eynî belgeyê û biryarê de, muxalefeta (dijderketinê) çend kesan ji biryara kûştina Seîd ELÇÎ re bi destnivîseke cûda hatibû nivîsandin.

Cûdabûna nivîsa muxalefetê (dijderketinê), wê demê pirsra ku anîbû bîra min ew bû, ku piştî deşîfrebûna (diyarbûna) kûştina Seîd Elçî û girtina Dr. Şivan, ji aliyê Çeko û Brûsk , hatiye nivîsandin.

Ew kesên li hemberî biryarê dijderketîbûn, qasî tê bîra min; Melle Mehmed OKUTUCU, Melle Ebdulkerîm CEYLAN, SORO û KURDO bûn.

3. Nameya Soro (Nazmi Balkaş) :

Piştî kûştina Seîd ELÇÎ û hepiskirina Dr. Şivan, Brûsk û Çeko, SORO nameyek ji serokatiya otonomî û PDK a Iraqê re nivîsandiyê.

Ev nivîsa, destnivîsareke, sê û yan jî çar rûpel in: Helbet ji bona ku SORO sax e, dikare di vê pirsê de agahdarî bide. Lewra, ev, ji bo Soro, berpirsiyariyeke dîrokî ye jî.

Di nameyê de tiştên tîn ser zimên û tîn diyarkirin ew in:

a) Dûr û dirêj pesnê Seîd Elçî tê dayîn û rola Seîd ELÇÎ di tevgera

Kurdên li Tirkiyeyê çî ye de agahdarî dide. Soro êşa xwe di derheqa kûştina Şivan de diyar dike.

b) Ji xususiyetê Şivan bi negatîfî behs dike.

c) Bûyerê bi plana komûnîsta girê dide. Ji navê çend komûnîstên Kurd yên wê demê diyar bûn tê behs kirin. Ew

komûnîstan: Dr. Tarik Zîya EKÎNCÎ (Hevbajariyê Soro ye), Nacî KUTLAY, Canîp YILDIRIM û kesên din bûn. Di nameya Soro de hevgerêdana Dr. Şivan û van komûnîstan tê diyar kirin. Tê gotin, ku Dr. Şivan, bi plan û bi zanyarî ji aliyê komûnîstan de hatiye şandin. Encama vê planê Seîd Elçî hatiye kûştin..."

Şakir Epozdemîr jî di nivîsara xwe de diyar dike, ku dema ku ew, Soro û hevaleyê din diçin cem Îdrîs, wî gotiye, ku ".. kûştina Seîd ELÇÎ plana komûnîstan e..." Wek min li rêzên jorîn behs kir, wê demê li Diyarbekirê di derheqa vê pirsê de belavokek hat belav kirin, di wê bela- vokê de jî, ew nerîna tê ser zimên.

Gorî bîr û reya min, Ew nerîna, ku dibêje "kûştina Seîd Elçî plana komonîstan e" li cem Îdrîs Berzanî û serokatiya otonomiyê û partiyê de çê bûye, encama nameya Soro ye.

DI ENCAM DE

Bûyera Seîd Elçî û Dr. Şivan, bûyereke trajedîk û dîrokî ye. Bi vê bûyerê, tevgera kurd li Tirkîyeyê, darbeyeke mezin xwar. Dîsa bi wê bûyerê dijminatîyeye nexweş di nav tevger û qadroyên kurd de pêk hat: Bû asteng ku qadroyên kurd nêzikê hevûdu bibin, bi hev re yekîtiyê pêk neînin û xebatê bi hev re nekin.

Li ser vê bûyerê mûnaqeseyeye vekirî û di standartên-pîvanên medenî de nekirin, bû sedem ku birakuji li Tiriyeyê fireh û kûr bibe; gelê Kurd û qadroyên siyasî li hemberî birakûjîyê, bê çek, bê pusula û zanyarî bimîne.

Di vê pirsê de nerînên cûda-cûda hene. Ew jî gerek gelek tebîî û normal bê qebûl kirin. Dema ku ew nerînan bîn pêşkêş kirin, nûqteyên (xalên) mişterek û nerînên hevbeş dê derkevin holê: Di encamê de ev helwesta dibe sedem, ku ew êş û nekokiyên nav qadroyên siyasî ji holê radibe.

Qismek qadroyên siyasî di wê nerînê de ne, ku kûştina Seîd ELÇÎ jî, ya Dr. Şivan jî plan û qomploya serokatiya otonomiyê û yan jî beşek berpirsiyarên PDK a Iraqê yê herêmên Zaxo-Duhokê ne. Gerek ew nerînan jî bîn pêşkêş kirin.

Gorî lêkolîn, guhdar û xwandina min, ez gihîştîm wê reyê, ku Dr. Şivan bi xwe di dereca yekemîn de berpirsiyar e. Ew îxtîrasa wî

û ew reya wî ya otorîter, ku jî derveyî xwe serok, rêxistin nasnake bûye sedem, ku biryara kûştina Seîd ELÇÎ bigre. Lêbelê mûmkin e, kesên ku ew teşwîk kiribin jî hebin. Lêbelê berpirsiyariya wan bingehî û di derece yekem de nîne.

Tiştêkî gelek vekirî û zelal heye, ku wek tê behs kirin, planeke merkezî li holê nîn e.

Mahkemekirina Dr. Şivan li herêma Otonomiyê, gelek normal û huquqî bû. Lewra, otonomî beriya her tiştêkî mecbûr bû, ku li herêmê otorîta huquqî saz bike. Di bûyerê de kesê hatiye kûştin serok, yan jî sekreterê partiyeke kurd û yê beşeke din e. Bi bûyerê vîcdana gelê kurd darbeyeke mezin xwariye û bê edaletiyek hatiye holê.

Lêbelê di encama mahkemekirinê de biryara kûştinê, gelek giran û ne di cîh de bû.

Di vê merhelê de her çiqas dereng jî ketibe, belav kirin û pêşkêş kirina belgeyên dadgehê yê mahkemekirina Dr. Şivan vatiniyeke dîrokî ye. Di vê pirsê de jî PDK a Iraqê berpirsiyar e.

02. 01.1999

Destnivîsa Biryara Kuştina Seîd ELÇÎ

Mesela Seîd Elçî û sebebên kuştina wî ji me ra hat pîrskirin, ka qezîye çî ye û bi çî awayî çêbûye

1

Mesela Seîd Elçî û sebebên kuştina wî ji me re hat pîrskirin. Ka qezîye çî ye û bi çî awayî çêbûye?

- 1- Her weha hîn draman, em Kurdpeşwêr in û eva di salin em bi emel di nav Sorîya Kurdistanê Iraqê de û di bira serokatiya Mela Mustafa û jê Karbidestên Sorî de bi dîl û car û bîpêse dixebitîn. Bi heta, di wextê şer û bombe kirinê de û di qada şer de me ew xebat kir. Piştî 11ê Adarê jî, diwa bi dilsozi em şûn ka Serok û MS. PDK jî wan re got ku, em dixwazîn ji bo na Kurdistanê Bakûr jî xebata siyasî bikin.
- 2- Piştî razibûna Serok û MS me diwa bi dilsozi û bi dilsozi dest avêt xebatê. Û PDK-T bi vî awayî di 28ê Hezîrana 1990 de û bi îstiraka 14 hevalên endamên Q. Merkezî saz bû. Niha jî Program û Nizamnîgama Mawezî ya Partî, raporta şiklê xebatê ya partî û raporta stratejî ya partî û dîwana teorî û tî ba MS. PDK mevînd in. Bi heta îro, me tim û tim di gel Fshed Xepêrî, MS û Serok dan û standan ku û di dîroka xebatê xwe de ji malûmat daye wan û em pêbawer in ku karbidestên Sorîs bi vî law û standana me bop draman ku em bi dilsozi, fîdakari û bi hesasiyeteke bilind guêdayî jê Sorîya Kurdistanê in û tim û tim me menfaqeta Sorîs û nîmarê a Kurdistanê Iraqê parast û menfaqeta wan bi ser menfaqeta Kurdistanê Bakûr re girê jî ber ku Kurdistanê Nivro, Serok û PDK jî bona me realîfîn tarîxî in û em wan wek pêşeng û ronahîyê bilind dibînin ji bona perçes Kurdistanê in.
- 3- Seîd Elçî û hevalê wî Derwîşê Sada (Mêgul) eva safek zêdetir e, ji bona pêşkirina xebatê me li her derî digerin. Li ba we malûm e ku par şî awayî hatin û gawêde me kirin. Diwa zîllatên çûyî jî ji bona vî yekê bi rava Ferîsê de inoqê berdayî

Ferdîna Comu

şandin ba İse Sivar. Piştî Elmedî Huseyn re kum Beğ-
 rîze, Sürîye û vir Tîrtok aşkerayê ku ew Elmedî hu-
 seynê bi pasaporta Tirkan diçerê di emna Tirkan daye.
 Armanca Seid Elî, Elmedî Huseyn û Tirkan ew bû ku
 em an bîn kustin an jî Kurdistanê Iraqê bêtin derxer-
 tin. Ji ber ku xebata me xebateka dîlsoz, fedakar û bi-
 dd û can bû. Patêsin Tirkan Seid û derweş ji xwe re
 kum xulam. Bi pece û xapandina siyaset ew kum
 pey me û parta me. Vê carê Seid bi arîkari
 û feşvîga Emna Tirkan derbasî Sürîye bû û piştî
 ku derbas bû Tirkan bij mayê wî xwend. E ku Seid
 Elî derbasî Sürîye kir û serî Iraqê, jî Emna Tirkan
 Mohemedê Beğ bû. Ev ^{ve} Nuseybîni ye û hemî Nuseybîni
 jî diroma ku ew di Emna Tirkan daye Mohemedê
 Beğ Nizamnama Parta û Raportêla Partî testîmî
 Tirkan kir û ji wan re da zanî ku em di nav sorîya
 Kurdistanê Iraqê da re û di ber Emrê Mela Mutefa de
 dixebitîn. Ji ber hîrdê bû ku ~~Stûkwestî~~ ^{Stûkwestî} Tirkan, Radyoya
 London, A Cûki ya (Iscaill) pê ve gotin ku: "Mela Mutefa li
 Kurdistanê Tirkiya partîkê sorîyê teşkil kiriye ku li wê
 derê sorîde bike". Mohemedê Beğ ew yek bi serahet
 got û muccirîniya xwe qebûl kir.

Piştî pûşiyana ma Seid Elî bixwe ji îtirafê ker ku
 piştî danîna Ofîsî-îdara leşkerî, li gel Zabitê Emna
 Tirkan li Istanbûl, İngere û li Diyarbekur gerîyayê û
 jî bona Sara û Nuseybîni û Sivar jî li Tehwanê
 bide gûtin, îxbara wan kiriye. ~~Pa~~ ^{Pa} û arîkariya Tirkan
 kiriye.

Bi Rasti jî, ger Sara bi lez jî Nuseybîni derxerîbûn
 û Sivar jî du neç beriya qetê xwe re gûn bûn Tokan,
 ew her du jî dihatin gertan. Û wê delîlên xisar jî bona
 Kurdistanê Iraq û Serol da ketibûn, nav leşer Tirkan.

~~Leşkerî~~

~~Emna~~

4-) Parta me li gora sistema Otocita mekeri dixebe-
te. (Ml(4) Nizamnameya Navxweya PDK-T)

Li gora Ml. (14) banda (f) ji, karbidestên Partî-
dikarin sermaye xuyandê bikin û tefiz bikin.

Pistî mihkeme kirina Seid Elci û Mihemedê Bege,
karbidestên Parta me, li ser delil û itirafên hea du-
yan bawer ani ku ev hea du mirov xayinê miletê Kurd,
û Şerîfa Kurdistanê re û diyal Emna Tirkar ji bona
pûs kirin û kurtina me xebatê dikin û ji bona kiradê
wezîfe ji wan re hatîye dayîn.

Li ser vê bawerî û qeweta karbidestan, sîkretêre
Tevayî Feridûn û Sîkretêre Lûdu Gavaz bi hev re
ji bona tefiz kirina sûcê xuyandê emir dan sê
endamên Partî û ev emir hat tefiz kirin.

Karbidest û cihazê partî "dîfektore ku ev qezîye, qez-
yekê Kurdistanîya Tirkiya ya û Partî dikare berdesthegê
vê qezîyê de qirarekî serbixwe bike. Ji bona vê sende-
ye ku bi navê PB ya PDK- li Tirkiya ev qezar hat
standin û tefiz kirin.

Beş, ji bona vê qezîyê, ger me qewete karbidest-
tên Kurdistanîya Nûra (Iraqê) pirs bikin bûna, gelêk bawer
de bûn. Nihayem ev xelkî û kêmariya xwe qebûl
dikin. Lê em lîsa tirkar dikin ku em ji berawerî
Şerîf, Serok û PDK muxlîs in.

Lê belê Seid Elci û Emna Tirkar li helak û kurt-
tina me gerîyan. Her mexlîg û hea parta şerîfger
meqbûrê xwe biparêze, û helak ~~me~~ me ye ~~ji~~ ji
ji wîha emra dika. "Ger yek bixwaze te bukêje tu
ji dikarî wî bukêji."

Çi elage û dijmanahiya me ya şexsî bi van mirovan
re nîne. Em tirkar dikin ku Seid û Emna Tirkar
ji bo vê kurtîyê em meqbûr kirin. Ji ber ku ewan di
xwest me pûs bikin û ji ortê radin.

Şerîf

Gavaz

Daxwaza me ya dawî ewa ye. Q. Markaziya Parta me de kambûna xwe ya sîsêmin (3) de biyar standî bû. Ga-
 von xelatiyek di nav me û Sorîya de çê bû û şarîşî
 acîz bû gere xebat bête rawestandin. "Li ser wê
 biyarê pîştî vê qezîyê û acîz bûna karbidestên şarîşî es-
 damên Q. Markaziya Parta Me ên bazir di gel me rûmîştin
 û ji me re îtimadên xwe diyar kirin û em teyîd ki-
 rin. Bes me hemûyan bi ~~te~~ tîyaq û bi hev re qerar
 stand ku "Ne pûrskirina me xelatiyêke û ew xelati bea
 pûrsiyarên şarîşî acîz kirîye. Ji bona vê yekê ji PDK-Tî
 Tirkîya xebatê xwe rawestand û çavênê qerarê we
 di xekine."

Nîsket me, em bendewar û dilsoz şarîşî û we me
 Xîzmeta me bi emel û karê me xuyaye; Çi di nav
 sefêrê şarîşî û çî ji ka we malîm e. Ji ber van
 yekên wa em xwe pûrsêk ji we dihesînkirîna û
 heqê me heye ku em wek şarîşîyêk hevalên
 we, dostên we û di bin xîzmeta şarîşî û di nav
 şarîşî de û li ser fayda kirina karbidestên şarîşî
 daxwaz dikin ku ^{li vê} xelatiya me bibarin. Ji ber ku di
 manajê bîgehîna û ji beramberê şarîşî û PDK- da çî sêgê
 me ni ne.

Not: Ger daxwaz hebe em dibarin bi deulî malîm
 tîza zêde ji bidin.

Şekretêrê Temyîzê PDK-T
 Peridîn (M. Sivan)
 Tawîk

Şekretêrê Dûluyê PDK-T
 Gavan (Çeko)
 Çaman

Em arêdamê Q. Markaziyên PDK-T ku li vir hazir in vê
 pênîyara jorîna her du Şekretêrên me teyîd û qebûl dikin

Dicle (Kurdo)

Rustem (Soro)

Dilovan (Zendo)

Ewi Raporteki em emxa dike Madale 4 bende
 suweda dinwini sereker i halikarwané xwi tenfux.
 kurua karaw emir dane halbuti indame M.S ewi herda
 hevale me ba kustuna van ju i tenfuxkurua gektu wida
 ju kasar bu sere xwe dane em 3 heval anak
 wakta pusuwana we gaxiye em agadar kun we me
 we mesele no pijijet Alada Be gaxiye we sukla
 madde ewe dawam em ju kakul dikin.

Dalovan (Zendo) Die (e kundo) Rustem (soco)
awo Dula Rustem

Di ve raporda ha de

Beşê Duwemîn:

**Nivîsarên di Derbarê Dosya Bûyera
Kûştina Herdû Saîdan da**

KIM Katil Kim Maktül*

Ahmet Kaymak

Tarih her soruya yanıt verebilmiş değil; veremeyebilir de.

Tarih yapan insanın, özel hallerde, güncel yada yaşamda yerini koruma kaygısı kimi gerçeklerin gün yüzüne çıkmasını engelleyebilir. Bu sav, daha çok siyaseti ele alan tarih için geçerlidir; bunun belirgin özelliği yada zaafi gerçeklerin gün yüzüne çıkmasını geciktirmektedir.

Burada, doğru yargının; zor da olsa, bu gecikmeyi beklemesi ya da onu aşmasıdır. Yargı bekleyebilir, ama insan beklemeye tahammül edemez. İnsanın sorgulayıcılığı burada önem kazanıyor. Sorgulamak ve sonuca gitmek, doğru bir yargı için tarihi ir çabadır ve bu türlü bir çabayı sorumlulukla desteklemek gerekir.

War dergisi iyi bir iş yaptı; karanlıkta kalan ve daha çok siyasi amaçlı saptırmalara konu olan yakın tarihimizin çok önemli bir olayının açığa çıkması için bir tartışma başlattı: Sait Elçi ve Dr. Şivan olayı....

Bu olaya ilişkin ortaya gelen anlatımlar ve değerlendirmelerin titizlikle izlenmesinde yarar olacağı kanısındayım. Çok değişik alanlarda uzman olanlar, özellikle uzmanlık alanlarını ilgilendiren noktadan bu anlatımlara bakarak olayı değerlendirmeleri, olaya ilişkin sağlıklı bir sonuç çıkarmaya olumlu halkalar ekleyebileceğinden, ayrıca yararlı bir çaba olur, diye düşünüyorum: Siyasetçiler, bilim adamları, hukukçular, kriminalistler vs...

* Roja Teze, sayı:6, 7 Ağustos 1999

War dergisi'nde ortaya çıkan açıklama ve değerlendirmeler usul bakımından doğru gelmiyor bana: Olay yeniden mahkeme ediliyor gibi bir sezgi beni bu konuda bir uyarı yapmaya zorluyor. Ortada bariz deliller yok; iddialar var ve bu iddialar siyasi niteliklidir. Bu açık görülüyor. Sonra özellikle Sait Elçi taraftarları, burada müşteki gibi davranıyorlar. Böyle olmamalı. Hem suçlayan hem yargılayan 'biz' olursak, vereceğimiz hüküm de 'bize' göre olacaktır. Tarih, 'bize' göre tek başına tek başına oluşan bir yargıya hak vermez. Doğru yöntem; Dr. Şıvan ve Sait Elçi taraftarlarını müşteki konumda ele almaktır. Böylece, olaya ilişkin ortaya gelecek anlatımlar, bilgi, belge ve değerlendirmeler daha objektif bir sonuç çıkarmamıza olanak sağlayacak gibime geliyor.

Burada İbrahim Güçlünün girdiği metodolojik hatalardan kaçınmanın yararını da vurgu yapmak gerekir. O'nun metodolojisindeki hata şu: söz konusu olayın meydana geldiği sürecin tümüyle dışında olan biri olarak, olayı ele alırken, vardığı hükümlülüktür. Olayla ilgili değerlendirme yapmış olarak yetinseydi, olumlu bir katkı yapmış olurdu kuşkusuz. Ama, tıpkı taraflardan biri gibi davranıp, onlarla aynı dili kullanması doğru yaklaşım olarak görülmez.

Şakir Bey de tutarlı ve doğru açıklamalar yapmıyor; çelişkiler, üstü kapalı vurgular; zihinleri açmaktan çok bulandırmaya yol açıyor.

Derwêşê Sado, görülüyor ki, bu olayın önemli aktörlerinden. Ama subjektif davranmaktan kurtulamıyor. Belki gerçeklerin ortaya çıkmasını istemiyor. Olayda sorumluluğu var da ondan! Dr. Şıvan ve arkadaşlarının infaz edilmeleri için elinden geleni yapanlardan biri, o olayın evveliyatında, Dr. Şıvan hareketini tasfiye planlarından uzak biri olduğunu da söyleyemez. Beyrut, Suriye ve H. Kisinger etkenlerinin ne anlama geldiğini sanırım çok iyi bilmektedir. Arkadaşları bilmesede; S. Elçi ve Z. Şerefhanoglu'nun Dr. Şıvan hareketini bertaraf etmeye yönelik ciddi komplolarını yürürlüğe koydukları su götürmez. En azından Derwêş Bey bunları bilmezlikten gelmemeli.

Kim ne derse desin; ayrıca, Barzani bu olayda baş sorumludur ve gelişmeler onun kontrolünde cereyan etmektedir.

Dr. Şivan bu gelişmeleri ayırımında ve bizzat bu komplo planlarını Doktor'a bildiren ve onu uyarın Barzanilerdir!

Doktor, tehlikeyi seziyor; ama kendisinin ve arkadaşlarının sonunu getirecek gerekçenin temelindeki hinliğı göremiyor: Hareket Marksisttir ve Türkiye'ye karşı silahlı mücadele başlatacaktır...Sait Elçi'nin de tasfiye için Dr. Şivan'a karşı kullanacağı gerekçe esas budur: Şivan'ın partisinin "Marksist bir programı olduğu ve Türkiye'de bu temelde silahlı bir mücadeleye kalkışmayı öngürdüğü" Barzaniler'e rapor etmek...

Barzani ve dolaylı olarak MIT komploları yönlendiren aktörlerdir. CIA Barzaniler'i: MIT dolaylı olarak TKDP içindeki kimi unsurları yönlendirip kullanmaktadır.

Bu arada, konjoktürel durum nasıldır?

a) Barzani, kazandıkları otonomiyle bölgedeki konumu bakımından Türkiye'ye karşı olabilecek silahlı bir kalkışmayı kesinlikle tehlikeli buluyor.

b) Türkiye; kulağının dibinde otonomi kazanan Kürtlerin uzun vadede sorun yaşayacağı endişesindedir. Egemenliğı için bu gelişmeyi tehlikeli buluyor ve harekete geçiyor.

c) Bölgede ABD nüfuzu da darbe yemiştir; onun adına H. Kissinger devrededir. Bu alanda eski SSCB'nin artın rolü zemini kayganlaştırmıştır. Bu koşullar altında Türkiye ABD için büyük önem arz etmekte. Bölgedeki durumu kendi lehine çevirme çalışmalarına başlıyor.

İki planın b ve c halkaları birleştiriliyor: Türkiye ve ABD ortak davranıyor. Barzani zorlanıyor. Türkiye'nin karşı karşıya bulunduğu tehlikenin bertaraf edilmesi isteniyor. Plan böylece aşağı sarkıtılıyor: MIT; Dr. Şivan hareketinin artın nüfuzu ve gücü karşısında Sait Elçi gurubunun rahatsızlığını yakından bilmekte. Kimi unsurlarla dolaylı ya da doğrudan ilişkiye geçiyor. Amaç; bu unsurları Barzani ile buluşturmak ve Dr. Şivan hareketinin nihai

hedeflerinin ne olduğunu rapor ettirip tasfiyeyi hızlandırmak...

TKDP yetkililerinin Sait Elçi olayından önce kimi hazırlıklar içinde olduğu, olaya ilişkin olarak yapılmış açıklamalardan biliyoruz. Söz konusu hazırlıkların amacı; Dr. Şıvan partisini bölgeden çıkarıp Barzanilerin irtibat ve güvenine mahzar olmaktadır.

Barzaniler de planlı davranıyor. Bir yolla iki tarafı da bertaraf etmenin olanaklarını kullanmak istiyor. Sinsilik siyasetin en kirli yönüdür ve Barzaniler bu kire bulaşıyorlar: Sait Elçi gurubunu tasfiye amaçlı hazırlıklarının yine onlar Dr. Şıvan'a bildiriyorlar.

Sait Elçi'nin hangi amaçla ve de arkadaşlarından habersiz Suriye'ye çıktığını kimse bilmiyor. Kim çağırmış, o da bilinmiyor! Arkadaşları böyle diyor. Her neyse!.. Şu sav da akla uygun: Sait Elçi, Zaxo'ya geçerken, hükümet misafirhanesinde kaldığında, bunu haber eden Dr. Şıvan kaynakları; olsa olsa, yine Barzaniler'e bağlı bölge komutanları, ilçe kaymakamları ya da valilerdir.

Komployu sezen Şıvan bu haberi alınca vakit kaybetmiyor; hızlı davranmak istiyor. Hızlı davranırsa, hazırlanan komploları boşa çıkaracağını sanıyor. Sait Elçi ve arkadaşları Mihemedê Begê'yi misafirhaneden alıp götürüyorlar...

Belgeler, Sait Elçinin sorgulandığını söylüyor. Sorgulamada neler sorulduğunu ve neler alındığını, ne yazık ki bilmiyoruz. Ama en azından Dr. Şıvan'ın kısmen bilinen savunmasında; partisine ve mücadelesine karşı girişilen komploları ve komplo senaryolarının hangi odaklarla ilişkili olarak yürürlüğe konmak istendiğini, iddia ettiğini biliyoruz.

Sait Elçinin infazı bu iddialara dayalıdır.

Böylece planın bir ayağı bu olayla tamamlanıyor. İkincisini uygulamaya sokmak kolaylaşıyor. O ana kadar olayları perde gerisinde izleyen Barzaniler doğrudan devreye giriyor. Olan oluyor; iddialar hazır: 'Kendi egemenlikleri altındaki bölgede cinayet işledikleri gerekçesiyle' Dr. Şıvan ve arkadaşları idama mahkum ediliyor...

TKDP yetkilileri rahatlıyor... Barzani rahatlıyor... Türkiye rahatlıyor...

Sonu: bu olaya iliŐkin ne oldu, nasıl oldu, sorusu daha epeyi yanıt arayacak. Kesin bir yargının oluşması; belgenin, soruşturma zabıtlarının, mahkeme tutanaklarının ve namuslu tanıkların vereceđi bilgilere bađlıdır.

Buna karŐın; Őimdiye karŐı anlatılanlar ve ele geen objektif bilgilerden yola ıkararak yargı deđil de sađlam bir varđı elde etmek mmkn: Kriminal planda meydana gelen bir olay karanlıkta kalmıŐ ve sorumluları bilinmiyorsa; bilimsel ve ŐaŐmaz olan Őu kuraldan hareket edilerek sonuca varılır: Olayın sonularından kim yada kimler yararlanıyorsa, sorumlu yada sorumlular, odur!

Őimdi

Kim katil, kim maktl?

Kim bilir, belki hepimiz...

**ABD - İran - Türkiye ve Barzani'nin
1970 'Komünistlerle Mücadele Antlaşması' Ve
Dr. Şivan, Süleyman Müini
Ve Arkadaşlarının Katledilişi**

Hasan Cûnî

Kürt siyaset tarihi içinde önemli bir yer tutan Dr. Sait Kırmızıtoprak (Şivan) ve arkadaşlarının katledilmesi olayı, üzerinden yıllar geçtiği halde hala güncelliğini koruyor. Bu olay yeni dönem Kürt siyaset sınıfı için önemli derslerle doludur.

Dr. Şivan, Süleyman Müini ve arkadaşlarının katledilişleri olayı, anti komünist soğuk savaş çerçevesinde Kürt sosyalistlerinin ehlileştirilmesi operasyonlarının bir parçası ve emperyalist 'Yeni Dünya Düzeni'cilerinin ulsal kurtuluş ve sosyalist önderliklere karşı güttüğü politikayı gün yüzüne çıkarmak için de önemlidir.

50'ler sonrası sol ve Kürt mücadelesi anlatılırken ismi sıkça duyulan Sait Kırmızıtoprak neden okları üzerine çeker ve öldürülür? Sorunun yanıtı emperyalizm sömürgeciler ile içiçeliğinin yanı sıra parçacı, gurupsal, aşiretsel çıkarlar uğruna geleceklerini düşmanın 'iyi niyet'lerine teslim edenlerin, 'akıllı' politikalar izlediklerini düşünenlerin, esasta bugün birer piyon haline gelen duruşlarını gördükçe insanın bir kez daha düşünmesi gerekiyor. Kürt halkının mücadelesindeki yerleri açısından bakıldığında Kürt siyaset yaşamına çöreklenmiş bu kesimlerin Kürtlüklerini hep devrimci dinamikleri tahrip etmek için kullandıkları görülür. Onlar için 'Şoreş' (Devrim) boş bir kavramdır. Bu kimseler yaşamlarını devrimci -

sosyalistleri imha etmeye adadılar. Kendi deyimleriyle ‘asi, kaprisli, laf dinlemez, serseri, diktatör çocuklar’ Kürt mücadelesinden söküp atmak gerekiyor. Bugün bile yaptıklarını alenen ve utanmazca savunabiliyorlar. Düşmana hizmet ettiklerini kabul etmek bir yana, vicdan muhasebesi yapmak yerine kubanlarını suçlamayı sürdürüyorlar.

Dr. Şivan Kimdir?

Dr. Şivan, ‘38 Dersim katliamı’nda şans eseri kurtulabildi. 1959 yılında ‘49’lar davası’nda yargılandı. 1960’larda TIP içinde yetti. 68 Dünya gençlik hareketindeki radikal devrimci esintiden etkilendi. DDKO Kürt gençlik hareketinde kendini buldu. Dönemin gençlik eylemlerini önemsemekle birlikte kurtuluş için yetmeyeceğini görerek, savaşımını şehir-kır, gençlik-aydın, işçi- köylü tüm kesimler içinde sürdürmek üzere yönünü dağlarına ve halkına çevirdi. Gelenekçi Kürt siyaset sınıfının feodal-bölgeci, hatta ümmetçi özellik ve ilişkilerini aşarak modern ulusal bir çerçeveye oturttu ve mücadelesine evrensel bir nitelik kazandırdı. Devrimci araç ve ittifaklar sorununu yeni bir anlayışla oluşturdu.

